

*Lûs û  
hêlînên  
çivîkan  
hilweşandin*



Rûpel 16

*Li Ewrûpayê li dijî têkoşîna gelê Kurd*

## Hevkariya MÎT û BND'ê



Pişî hevdîtinê Tansu Çiller û Helmut Kohl tîkiliyên MÎT û BND'ê jî zêde bûn.

**L**i Almanyayê MÎT'a Tirk û BND' a Alman bi hev re dixebitin. Her du rêxistinên îstîbaratê li dijî gelê Kurd zendên xwe vemilandine û kontrolên xwe yên li ser mal, karistan, ofîs, komele û saziyên Kurd ên li Almanyayê gurtir dikin. Ji hêla din ve MÎT li Ewrûpayê stratejiya xwe diguherîne. Di vê guherînê de xurtkirina kom û rêxistinên Kurd û Tirk jî hene.

**A**lmanya di şerê PKK û Tirkîyeyê de li ser daxwaziya NATO'yê bi Tirkîyeyê re li dijî têkoşîna rizgariya neteweyî ya gelê Kurd têdikoşe. Herdu dostên bav û kalên hev, li ser kedxwariyê û domandina wê ya li Kurdistanê her di milê hev de ne. Berpirsiyara NATO'yê ya Tirkîyeyê Almanya erka xwe di şerê qirêjî de li hemberî gelê Kurd pêk tîne.

Rûpel 8

### DI VÊ HEJMARÊ

Dengvedana Şerê Yekemîn ê Cîhanê di wêjeya Kelhûrî de Anîs Rûpel 13

Cejna sersalê û Geliyê Laleşê Îdo Babaşêx Rûpel 14

Wan jiyaneke hevpar û azad diparast Niwa Hebîb Rûpel 12

Çend rêziman û rênivîsên Kurmancî hene? Baran Rizgar Rûpel 10

Bila êdî xwîn nerije! Rûpel 5

### Stranên feqî û keçikan



**D**i dîroka Kurdistanê de medrese, mele û feqî cihê girîng digirin, ev rastî îro jî beyan e. Em dizanin ku di vê dîrokê de rewşa xwendinê û zanistiyê bi van medreseyan kifş dibe. Rûpel 11

*Serokê Giştî yê Komeleya Kurdên Sovyeta Berê Yura Nabiyev*



“Armanca  
me afirandina  
azadî û  
yekîtiya gelê  
me ye”

Demek berê hevalê me bi Serokê Giştî yê Komeleya Kurdên Sovyeta Berê re hevpeyvînek pêk anî. Serokê rêxistinê Yura Nabiyev ji Kurdên Gurcistanê ye. Nabiyev di hilbijêrînên Meclîsa Neteweyî de wek nûnerê Kurdên Gurcistanê hatibû hilbijartin. Ji hêla din ve Nabiyev Serokê “Ronahî”yê ye ku, rêxistina Kurdên Gurcistanê ye. Di dema Yekîtiya Komarên Sovyetê

yên Sosyalîst (YKSS) de statuya Kurdan a neteweyî çî bû? Di pey hilweşîna Yekîtiya Sovyetan de di rewşa Kurdan de çî guherîn çêbûn?

—Ne rast e ku bi aliyek bi tenê nêzîkahi li rewşa Kurdên Sovyeta Berê bike.. Bi qewmîn û pêvajoyan re rewşa Kurdan jî guheriyê û bilindbûn û nizimbûn tê de çêbûne. Di warê çand û hêvotinê de derfetên girîng hatibûn Rûpel 9

# Tifaqa terorîzmê û xwînrijandinê

Berî çend rojan, komcivînek di navbera deh partiyên li Tirkîyê de hate li darxistin. Bi meram û bi qesta li meseleya têkoşîna li hemberî terorîzmê ya li Tirkîyê sekinîn. Lê belê gişan dinya û alem bi xwe hesandin ku, dewleta Tirk bi hestiyarî ve tîye xwarin. Ji sempatîzan û gerîlayên PKK'ê re gotin, "Ermenî, fileh û terorîst in." Meseleya bîst milyon Kurdî wek terorîzmê nîşandan. Bi tenê wek aşîqê ku aşîqê xwe bûye, behs û pesna xwe kirin. Mafên însanê Kurd dîsa înkâr kirin. Rojên civînê bi hîle û eh-wale derbas kirin. Gef û gurr jî avêtin PKK'ê. Generalan dev avêtin PKK'ê û gotin: "Emê heta biharê koka PKK'ê bînin." Di eynî demê de, dinya alem, ajansên xeberan, heyetên mafên însanan, ronakbîr, diplomat, hikûmetên dewletan giş li Tirkîyê

ecêbmayî diman. Kesî nikaribû tesewir bike ku, hêzên siyasî û demokrat li Tirkîyê çawa dibe ku, ev çend sal in wiha ji rastiye dûr in, derewkar û sextekar in. Serokwezîra Tirkîyê Çiller, dema hat Almanyan ji wê pirsî: "Ma sebeb çî ye ku tu wek yên berî xwe nafikirî, der barê meseleya Kurdan de riya aşîyê nagirî?" Çiller aciz bû, got: "Em ji bo 5 hezar terorîstî axa Tirkîyê parçe bikin?" Ronakbîrê Alman lê ma ecêbmayî, ji Çillerê re got: "Jêderên Tirkîyê û çavdêrên siyasî li derve dibêjin 300 (sêsed) endamên PKK'ê hene". Abdullah Öcalan, Serokê PKK'ê di gel axaftinekî bi xeberbêjekî Fransî re dibêje: "Dewletê ji bilî riya şer tu rê nehiştine. Dewlet me mecbûr dike, yê ku şer naxwaze em in, dewlet li hember dax-

wazên me dibêje ku emê koka we bînin. Niha 13 hezar gerîla di berxwedanê de ne, ger em bixwazin dê 500 hezar kes bêne şer". Berê partiyên Tirk ne li aşîyê ye, siyaseta PKK'ê jî ne mimkun e ji bilê heq û huqîqên gelê Kurd bilive. Êdî jê tê xwestin ku derbên mezin li bin guhê dewletê bixe, ta ku tê ser heqiyê û berê xwe dide aşîyê. Têkoşîna PKK'ê îro jî berê germtir û gurtir e. Mirovên Kurd, ên ku berê dîtinên PKK'ê qebûl nedikirin, îro di nav refên gerîlayan de ne. Partiyên Kurd ên ku heta doh li PKK'ê rexne digirtin îro hevalbend in. Gotinên terorîzmê jî, cih nagire, rûyê geş tu carî reş nabe. Tifaqa hêzên Tirkîyê ya li ser terorîstiyê û xwînrijandinê, dê heta ku derê bimeşe? Di bawerîya min de ta dawiyê bi vî rengî naçe. **M. Dewran**

# Nivîsara Welat

## Welateke nû û hemdem

**H**eftiya berê, me behsa Welateke 24 rûpel û rengîn kiribû. Pêwist e bi dorfirehî li ser vê mijarê bê nivîsandin û naveroka vê Welata nû ji xwendevanên wê re bê diyarkirin.

Em çima guhirîneke bi vî rengî difikirin, pêwist dibînin û çî ne ev veguherîn? Ji roja ku Welat derketiye heta îro, me bi sedan name ji xwendevanên xwe girtine û bi hezaran kesên Kurd re jî li ser Welat û rewşa wê, danûstandina dîtinan kiriye. Di pêvajoya hemû van pêwendiyên nivîskî û şîfaî de, me hewl da ku kêmasî û çewtiyên xwe tesbît bikin û hê jî em vê helwesta xwe didomînin.

Di encamê de hate têgihîştin ku Welat bi veguherîneke cidî dikare bi awayekê bala zêdetir kesan bikşîne û hejmara xwendevanên xwe zêde bike. Ji ber ku em xwendina zimanê Kurdî ji bo Kurdan pîrr girîng dibînin, zêdekirina xwendevanên jî li ber me hedef û wezîfeyek e. Çi bûn kêmasiyên me û divê Welateke xweguhertî çawa be?

**Di destpêkê de em zêde li ser rewş û sewiya xwendevanên Kurd ne fikirin û bi nivîsên pîrr dirêj û hevokên kompleks û sloganên siyasî me rê li ber dorfirehbûnê girt. Kurdên ku bi sedsalan bi hesreta rojnameyekê dijiyan, pêwist bû bi nivîsên kurt, bi wêneyên balkêş ên rengîn û bi teknîkeke tekûz bihatana vekişandin ber bi xwendina Kurdî ve.**

Di destpêkê de em zêde li ser rewş û sewiya xwendevanên Kurd ne fikirin û bi nivîsên pîrr dirêj û hevokên kompleks û sloganên siyasî, me rê li ber dorfirehbûnê girt. Kurdên ku bi sedsalan bi hesreta rojnameyekê dijiyan, pêwist bû bi nivîsên kurt, bi wêneyên balkêş ên rengîn û bi teknîkeke tekûz bihatana vekişandin ber bi xwendina Kurdî ve. Bala Kurdên ku di bin nîrê dagirkeriyê de pêvajoyeke dirêj mabûn, ji nişka ve bi nivîsên dirêj ên siyasî û bi wêneyên reş û spî ne mumkun bû bête vekişandin. Yên ku pariyek ji xwendinê hez dikir jî, nûçe û nivîsên dirêj û sloganî, bi rûpelên bê wêne û kêmetestetîk, hezkirina xwe ya ji bo xwendinê ne bi temamî be, jî winda kirin.

Helbet gelek kesan ev nivîsarên Welat diecibandin û bi dewamiya wê ya bi wî rengî dixwestin û dixwazin, wekî din Welat pîrr nîrxên nû û girîng diafirand û berhev dikir, bes me xwest di vî nivîsê de êdî zehf li ser kêmasî û çewtiyên Welat û sebebê kêmxwendina rojnameyên Kurdî bisekinin.

Me dixwest di vî nivîsê de li ser naveroka Welata nû bisekinin, bes cîh nema û em ji mecbûrî dihêlin hejmarên pêşîya me. Dîsa em divên dubare bikin ku ji bo Welateke nû û nûjen em bi çar çavan li hêviya pêşniyar û rexneyên xwendevanên xwe ne.

# Ferhengok

- |                                |                               |
|--------------------------------|-------------------------------|
| <b>Beledî:</b> Birûsk          | rêzê (sîradan)                |
| <b>Ewan:</b> Fesad             | <b>Rewîşt:</b> Karekter, xwiy |
| <b>Ewanî:</b> Fesadî           | <b>Saman:</b> Serwet, kilûr   |
| <b>Hencere:</b> Têlên dengê    | <b>Sinc:</b> Exlaq            |
| <b>Hereşe:</b> Gef, tehdît     | <b>Serperestî:</b> Jê çavdêrî |
| <b>Hewezi:</b> Qerebû (telafi) | <b>Şafir:</b> Step (bozkar)   |
| <b>Kosp:</b> Asteng            | <b>Şêrpence:</b> Qanser       |
| <b>Layen:</b> Alî              | <b>Tepeserkirin:</b> Serkutki |
| <b>Peyrew:</b> Xelef           | rin                           |
| <b>Pêşrew:</b> Selef           |                               |
| <b>Remekî:</b> Ketûber, ji     | <b>Zende:</b> bret            |

## Mirina li ser dozê

Ew bû bi agirê çiyê deng da  
Deng da ku zordestî miriye  
Ew bû bi çakûç li mejiyê wî da  
Ew ê ku mixê kalê me xwariye

Xwişk û birayên me dertên serê çîyan  
Dertên ku bimirin li ser vê dozê  
Ew doza ku heta îro hatiye  
Hatiye bi xwîna Jiyan û Bozê

Em sond dixwin ku ji vî riyê venagerin  
Vê rîya ku xwişk û birayê me li ser mirin  
Emê jî wiha wek wan bimirin  
Ta ku dijmin dest ji welat bibirrin

**Nazîf- Amed**

## Welatê min

"Welat"ê min..!  
Ez diyarî te dikim..  
Gulên tewir sor..  
Û geş...!  
Li ser rûyê erdê...!

Tu tişt min nîn e  
Ji xînjî dilê min  
Yê bi kul...  
Û birîn...

Ji xînjî va axa sor  
Lewre ji te re "welat"ê min  
Va dilê min...!  
Xwîna min jî...  
Ji bo axa sor...  
Yê herikiye li ser..!  
Xwîne nemirên me  
Rêber û hevalên me

Navê "welat"ê min  
Pîrr şîrîn e..  
Li ber dilê min  
Tîpên navê "welat"ê min  
mûm in...!

Çira ne...!  
Stêr in...!

Ronahiyê didin..  
Riya digihîne... Amedê... dilê  
welat...!  
**Dilkurd**

## Bibîranîn

# Zübeyde Sönmez

Hevala delal, xwarziya min! Te digot: "Xalol Qey em wek kevir ji dayika xwe bûn. Em çawa dikarin bédeng bimînin". Ev e, tu bi şehîdbûna xwe, bûyî dengê welatê xwe û tu bûy delîl ku dayikên Kurd zarokên dilkevir naynin. Piştî du salên ku te li ser axa welatê xwe serê xwe danî, bi sedan dilsozên wek te ku xwişk û birayên te bûn, li dû te hatin. Bîranînen we dilên me germ dikin û dibin hêviya pêşerojê.



**Salar Amedî**

## NÛÇEYÊN

## Dewlet dixwaze Kurdistanê vala bike

**Navenda Nûçeyan-** Hêzên dewletê wê hefteyê ji hovîtiyên xwe dane xuyan. bi tanq û topan bi ser gelê kurd ve çûn, gelek gund şewitandin û bi sedan insan xistin bin çav û bi sedan insan kuştin. Wisa tê zanin ku dewletê ji şerê hember PKK tu serfiraziyek neditiye. Ji ber wê rastiyê ye ku dewletê dev ji gerîla berdaye û hemû hêzên xwe ji bo qirkirin û talankirina gundên Kurdan bi rê xistiye. Ji aliyekê din ve ji gerîlayên ARGK'ê li her derê Kurdistanê livbaziyan xurt pêk tin.

**4 Mijdar 1993:** Hêzên dewletê avêtin ser navçeya Cûlemêrgê Celê. her der dane ber roketavê û bombeyan. Di bûyerê de gelek mal xesirîn. gelê navçeyê bi giştî ji navçeyê koç kirin.

Li gorî agahiyên herêmi artêşa Tirk li Cûlemêrgê li navçeya Navşanê nêzikayî gundê Pirnçekenê ji sinor derbas bû û kete Kurdistanê başûr. Le di navbera wan û gerîlayan de şer derket. Hêzên dewletê cerdî ser navçeya Kopê. ku li ser bajarê Mûşê ye kirin. her der dane ber gulebaranê. Li gorî agahiyên herêmi 200 milyon ziyar çebûye.

Ciyayê Cûdî. Herekol û Garbarê ji aliyê artêşa Tirk ve hatin bombekirin.

Leşkeran avêtin ser gundê Kalnis ku li ser navçeya Sêrtê Kufrayê ye (Sirvan) jê 7 mal şewitandin.

Li Sêrtê li navçeya Kufrayê (Sirvan) li gundên Pinze. Akyo-kus. Hesre. Evzint û Salanzoyê 116 cerdevan xwestin ku çekên xwe deynin: lê qereqola Kufrayê destûr neda.

Gerîlayên ARGK'ê li Sirnexê li navçeya Elkê cerdî ser gundê Dolê kirin û 4 cerdevan kuştin. jê 7 cerdevan 8 kes birîndar kirin.

Bi navê Yaşar Cantürk. Mustafa Uç du kes ku, MHP (Partiya Tevgera Neteweyî) dihebandin û ji dewletê re ajanî dikirin. li Dêrsimê li navçeya Pêrtaxê ji aliyên gerîlayên ARGK'ê ve hatine kuştin.

Gerîlayên ARGK'ê li Cûlemêrgê li navçeya Geverê bi navê Hatem Cakmak sercerdevanek kuştin.

Konvoeyeke leşkeran li herêma navçeyên Elbistan û Ciyayê Nurahe ku li ser bajarê Meraşê ne operasyon dikirin. welgeriya 17 leşker birîndar bûn.

**5 Mijdar 1993:** Hêzên dewletê avêtin ser gundê Mesken. Xirbê Kermête û Kermatê ku li ser bajarê Mêrdînê. li navçeyên Midyad û Mahsertê ne xesirandin û gundî ji gundan qetandin.

Li Mêrdînê li navçeya Dêrika Ciyayê Mazî bi navê Kanîgenik. Xirabekûr û Zozanê Xirbê Hilala ji aliyên hêzên dewletê ve hatine şewitandin.

Gundên li ser navçeya Sêrtê Hawêlê ne ji ber êrişên cerdevanan û leşkeran koç kirin. Li gorî agahiyên herêmi gelê van gundan koçî Qeyserî û Kocaaliyê kirine.

Pistî xesirandina navçeya Celê ku li ser bajarê Cûlemêrgê ye koçî lê didomin. Di bûyerê de 50 milyon ziyar çebûye. Li gorî agahiyên fermî û herêmi cerdevanên gundê der û dorên navçeya Celê. pistî çek danîne koçî

Kurdistanê Başûr kirine.

**6 Mijdar 1993:** Di navbera hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de li herêma "Kanên Madenê" şer derket. der barê şer de tu agahî nîn e. Li nêzikî Tabûra Ikizceyê ku li ser Bajarê Sirnexê ye. di navbera gerîla û leşkeran de şer qewimî. Sê leşker hatin kuştin. li gorî agahiyên herêmi hejmara birîndaran pirr in.

Pira Besta Sor ku di navbera Sirnex û Cizîrê de ye ji aliyên gerîlayan ve hate hilweşandin.

Li Ruhayê li navçeya Wêranşarê bombeyek avêtine Banqeya Ziraatê. ev livbazî ERNK'ê hilda ser xwe. Traktorek li Sirnexê li herêma Haçalo li mayîne qelibî. 7 kes mirin.

Li Amedê li navçeya Pasûrê 3 gund. li navçeya Pîranê gundek û 2 zozan. li Mûşê 4 gund ji aliyê hêzên dewletê ve hatine şewitandin. Di van bûyeran de gelek ziyar çebûye û birîndar pirr in.

**7 Mijdar 1993:** Gerîlayên ARGK'ê bombe avêtin Lokala Havacîlarê 9 leşker birîndar bûn. Gundê "Oğulköy"ê ku li ser navenda Cûlemêrgê ye ji aliyên artêşa Tirk ve hate bombekirin. Li gorî agahiyên herêmi gundê 600 mal bi giştî koçî cihên derê dikin. Li gorî agahiyên KURD-HA hêzên dewletê li herêmên gundê Cûlemêrgê Avê. Marinos. Kûtos. Bêlên û Binewşê operasyonên dorfireh pêk tinin.

Hêzên dewletê li gundê Ziravîkê ku li ser bajarê Cûlemêrgê Qilabanê ye 10 gundî kuştin. 5 gundî jî birîndarkirin. Di gund de gelek mal xesirîn.

Di navbera hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de li Pasûra Amedê li gundê Duderya şer qewimî. Dû leşker hatin kuştin û 4 leşker jî birîndar bûn. Li gundê Dûderyayê pistî şer. 4 mal ji aliyê leşkeran ve hatine şewitandin.

Gerîlayên ARGK'ê li Amedê li herêma di navbera navçeyên Çungûş û Çermûgê de rê birrîn û kontrola nasnameyan kirin. Di navbera gerîla û leşkeran de şer derket: serbazek. leşkerek û 2 timên taybetî birîndar bûn. Gerîlayan rêwiyek jî bi xwe re birin.

Li gorî agahiyên KURDHA leşkerên ku di navbera herêmên Mûş û Pasûrê de diçûne operasyonê. ketin kemîna gerîlayan jê 15 leşker hatin kuştin.

Li ser rîya Darahênê û Palûyê. Cizîr û Sirnexê û Sêrt û Dihê di navbera hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket. der barê kuştî û birîndaran de tu agahî nîn e.

**8 Mijdar 1993:** Konvoeyeke leşkeran di navbera herêmên Dêrsim û Malkîsiyê de kete kemîna gerîla jê 31 leşker hatin kuştin û panzerek jî dehibî. Hêzên dewletê li herêmên Mala Rewanî ku nêzikî bajarê Sirnexê li navçeya Silopiyê ye. ji gerîlayan re kemîn danî û 26 gerîla kuştin. Gerîlayên ARGK'ê êriş birin ser qereqola Smailka ku di navbera herêmên Hezo û Elihê de ye. 25 leşker kuştin. pistî bûyerê hêzên dewletê li der û dorên herêmê operasyonan pêk tinin. Ew gundê (Timoq) ku ji aliyê dewletê ve hatibûn şewitandin û nefî kirin. bi alîkariya serokê Belediyeya Hezo vegeriyar gundên xwe.

Li gorî agahiyên herêmi gerîlayên ARGK'ê li Dêrsimê li ser pîreya Paxê ji leşkeran re kemîn danî û 19 leşker kuştin. Gelek leşker jî birîndar kirin.

Leşkerên ku bi konvoyan ve li herêma Paşacikê ku nêzikî navçeya Malkîsiyê ya Dêrsimê ye ketin kemîna gerîla. 8 kes dane der û 12 heb jî birîndar bûn.

Malkîneyeke kar ya Belediyeya Sêrtê li herêma Kufrayê ji aliyê gerîlayan ve hate şewitandin.

Li Sêrtê li herêma Badayê gerîlayên ARGK'ê rê birrîn û ji rêwiyar re propaganda kirin û otobêsek şewitandin. Li îdirê jî otomobîlek ji aliyê gerîlayan ve hate şewitandin.

**9 Mijdar 1993:** Gerîlayên ARGK'ê êriş birin ser Qereqola Saxê ku li ser Wanê ye. 4 leşker kuştin. Li Cûlemêrgê jî gerîla cerdî ser Qereqola Celê kirin û 5 leşker kuştin. 7 leşker jî birîndar kirin.

Tesîsên Petrolê ya Şelmo 103 ya li Elihê (Batman) ji aliyê gerîlayan ve hate şewitandin.

Endamekî kontra li Hezeta Sirnexê li gundê Filê ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hate kuştin.

Li navçeya Agiriyê li Dutaxê hêzên dewletê dest bi operasyonan kirin. her derê navçeyê dan ber gulebaranê. Navçe 5 saet di nav agirên dewletê de ma û gelek dezgehên kar û avahî xesirîn. Hêzên dewletê 20 kes xistin bin çav. Li Cûlemêrgê jî operasyonên dorfireh pêk hatin. hêzên dewletê di êrişê xwe de mala Serokê Belediyeya Cûlemêrgê û hinek malên din xesirandin. Timên taybetî 5 erebeyên Behçet Ertûnc şewitandin. li gorî agahiyên herêmi 300 kes ji aliyên dewletê ve hatine girtinê.

Cerdevanan li Amedê êriş birin ser gundên Licok. Zenge. Entax û Mişrifê ku li ser navçeyên Hezroyê ne. gelek mal şewitandin. Gundê Karakaleyê ku li ser Qazizmana Qersê ye. hêzên dewletê cerdî ser kirin û gelê gund di bin lêdanê re derbas kirin. Bi navê Mehmet Taşdelen kesek birîndar kirin û xistin bin çav.

Li Sirnexê li navçeya Basê bi navê Sehrika. Zicin. Bane û Karîhajra ji aliyê leşkeran ve tene valakirinê.

Leşkeran avêtin ser gundê Xerxûrê ku li ser Berwariya Sêrtê ye. 3 mal şewitandin. Ji gund 13 kes xistin bin çav. Hêzên dewletê êriş birin ser gundê Nevalayê ku li ser Hezoya Elihê ye gelek mal di hacetên hundir de şewitandin.

**10 Mijdar 1993:** Hêzên dewletê li navenda Agiriyê li taxa "Hurriyetê" êriş birin ser malekê di navbera polis û kesên di mal de ser derket: komserek hat kuştin û polîsek jî birîndar bû. Di bûyerê de 2 gerîla jî hatihe kuştin. Gerîlayên ARGK'ê rîya Dêrsim û Pilemoriyê birrîn û kontrola nasnameyan kirin. 6 kes revandin.

Li Cûlemêrgê li navçeya Celê gerîlayên ARGK'ê cerdî ser qereqola Sivîtepeyê kirin û 16 leşker kuştin. Li gorî agahîya KURD-HA'yê serê ku li Sarîqamişa Qersê di navbera gerîla û hêzên dewletê de qewimî bû 3 serbaz (Binbaşî.asteymen û teymenek) û 15 leşker hatin kuştin. 20 leşker jî birîndar bûn.

## HAWAR

Dilbixwîn

## Siwarê hespa azadiyê (2)

Di meşa Apo ya 88 salan de gelek bûyer û serpehatî hene. Gelek rêhevalên rûmetdar ên weke Mîr Celalet Bedirxan, N. Zaza, Cegerxwîn û N. Dêrsimî tenê dîtin. Wisa jî nayê jibîrkirin ku, HAWAR jî parçeyekî jiyana wî bûye.

Werin em hinekî li biyografiya Apo bimeyzînin. Di 1905'an de li Pirrînê (Adiyaman) li navçeya Kollîkê (Kahta), li gundê Narîncê ji dayîka xwe bûye. Bavê wî Sebrî Beg serokeşîr bûye. Di nava şênîyê herêmê de mirovekî dewlemend û rûmetdar bûye. Piştî ku Sebrî Beg di sala 1918'an de diçe ser dîlovanîya xwe, apê wî Şukrî li Osmên dimeyzîne. Di dema serhildana Şêx Seidê Pîranî de herdu apên wî (Şukrî, Nûrî) ji hêla Dewleta Tirk ve piştî îşkençe û azîneyên zor û dijwar li Amedê bi bîryara Mehkemeya İstîqlalê tene daleqandin.

Dema ku du apên wî bi dar ve dibin, temenê wî 20 sal bûn. Lewma ji daleqandina wan bandoreke

**Di navbera 1928-30'i de ji bo birêvebirina Xoybûnê derbasî başûrê rojavayê Kurdistanê dibe. Li wir C. Bedirxan nas dîke û dest diavêje pênûsê û edî dinivîsîne. Li aliyekî xwendevan û li aliyê din jî nivîskar Apo di 1932'an de li ser rûpelên HAWAR'ê bi firehî li ser çand û tore û lîteratura Kurdî dinivîsîne. Bi wê hunera xwe ya dewlemend dibe yek ji himdarên A,B,C'ya Kurdî ya Latîni.**

mezin li ser wî dihêle.

Di 20 saliya xwe de bi hinek ciwanan re alîkariya serhildana Ş. Seid dîke. Piştî têkçûna serhildanê Apo di 1925'an de, tê girtin. 3 salan di zindanê de dimîne.

Di 1928'an de tê berdand. Di 1929'an de dîsa tê girtin, lê wê carê deliveyê (firsetê) dibîne û direve.

Di navbera 1928-30'i de ji bo birêvebirina Xoybûnê derbasî başûrê rojavayê Kurdistanê dibe. Li wir C. Bedirxan nas dîke û dest diavêje pênûsê û edî dinivîsîne. Li aliyekî xwendevan û li aliyê din jî nivîskar Apo di 1932'an de li ser rûpelên HAWAR'ê bi firehî li ser çand û tore û lîteratura Kurdî dinivîsîne. Bi wê hunera xwe ya dewlemend dibe yek ji himdarên A,B,C'ya Kurdî ya Latîni.

Dîsa Apo tê girtin (1930), wê carê jî li Sûriye û ji hêla Fransîzan ve. Wî surgûnî Reqqeyê dikin. Ji wir têkiliya xwe bi C. Bedirxan, Ekrem Cemil Paşa û İbrahîm Paşa re datîne, bi armanca alîkirina Serhildana Agirî (1930) bi dizî derbasî herêma Barzan dibe, li ser sinor gelek zehmetiyar dikişîne, tê girtin, direve. Surgunî Afrîqayê dibe, di (1937) an de jî vedigere Kobaniyê. Min li Kobaniyê kalek nas dikir, ew gelekî bi Apo re mabû, wî der barê Osman Sebrî de wiha digot: "Em ji gotin û rêhevaliya hev têr nedibûn. Bavê mêran bû. Xwediyê cesareteke mezin bû. Pirr jî, ji welat hez dikir, dema ku dihanî bîra xwe, digirîya, em jî bi wî re digirîyan, ez wê demê bi xweşiya welat hesiyam."

Piştî Kobaniyê di 1938'an de diçe li Şamê niştecih dibe. Li wir zarokên Kurdan hinî zimanê Kurdî dîke. Mamoste Osman Sebrî zanebûna ku ji Celalet Bedirxan girtibû, dide neviyên Medyayê.

Di sala 1956'an de Partiya Demokrata Kurdî ya Suriyê (PKKS), bi armanca "Rizgarkirin û Yekitiya Kurdistanê" dadimezirîne. Dîsa bi sûcê avakirina partiyeke îlegal tê girtin. Di zindanê de li ber xwe dide, hem bi canê xwe hem jî bi pênûsa xwe, xwe ji berxwedanê cuda nake. "Cihê herî rehet ev der e (zindan) ku ez tede binivîsinim, dijmîn rê nade min ez li derve pênûsa xwe bi kar bînim...!!"

Apo piştî wê rêveçûna dijwar diçe aliyê din. Bar dîke. Pelê dara wî diweşe û dilê wî xemgîn dibe, lê hema tu caran wê dîrok û nîşên peşerojê nikaribin van hevokên wî ji bîr bikin: "Eger ez mirim û Kurdistan ne serbixwe bû, ji laşê min re gurzên gulandiyarî nekin..."

## Ji dinyayê kurtenûçe

### Li Almanyayê:

Serokê Naziyan lêdan xwar

Serokê partiya neo-Naziyan a herî mezin Partiya karkerên Germanistana Azad, Friedhelm Buse li ser kolaneke Bonnê roja 6'ê Mijdarê ji hinek anti-faşîstan lêdanek xedar xwar. Li gorî agahiyên polîsan, di vê lêdanê de dîranê wî û hestiyên wî şkestine.

### Li Swêdê:

## 6 berhemên Picasso hatin dizîn.

Roja duşemê (8'ê Mijdarê) ji Muzeya Modern a Stokolmê bi şev du berhemên kubîstê Fransî Georges Braque û 6 berhemên Picasso ku bergidana gişkan 60 milyon dolar e, hatin dizîn. Li gorî jêderên polîsên Swêdî dizan bi şev bana muzeyê qul kirine, ketine navê û ev kar pêk anîne, polîsan li ser bûyerê tu agahiyên berfrehî nedan.

### Li Rojhilata Navîn

## Arafat çû Brûkselê

Serokê RRF'ê (Rexistina Rizgariya Filîstînê) Yaser Arafat ji bo bi destxistina alikariyên pereyan ji Civata Ewropayê çû Brukselê. Civata Ewropayê ji bo gerandina aboriya Filîstîna xweser ku, dê li gorî plana lihevkerîna li Gaze û Erîxayê pêk were ji bo îsal 90 milyon Ecus (pereyê civatê) ango 102 milyon dolar veqandine. Ji bo meşandina planeke peşveçûyîna aborî ya 5 salan jî 500 milyon Ecus (565 milyon dolar) dê bide. Ji lew re berpirsiyarên Civatê dixwazin ramanên Arafat li ser meşandina plana xweseriyê, ji nêzîkahi ve bibihîzin. Arafat li ser bûyerên paşin ku li warên dagirkirî pêk hatin jî Suriyê sîwdar kir, got ku, ev dewlet piştgiyariya hezên radiqal dike û nahêle plana aştiyê bimeşe. Li aliyê din lihevruştinên RRF'ê û Îsraîl ku bi fermî hatibûn birrhin, bi awayekî sergirtî didomin.

# Tirkiye bergidana Serhildana Kurdan dide

**Reutes-** Şerê Tirkiyeyê yê bi serhildêrên Kurd re ku şerê ku wek şerê heyîn û neyînê tê dîtin, di deh saliya xwe de xesareke mezin dide aboriya li Rojhilatê Başûr û zorê dide kîsikê gelê li Tirkiyeyê. Serok Wezîra Tirkiyeyê Tansu Çillerê, zêdebûneke nexwaş ya Baca Hejahiya Pêvedanî (KDV) êlan kir û daxuyand ku, zehfê pereyên ku li wir bi dest dikeve dê li şerê li dijî PKK'ê tê meşandin biçe û hinek jêderên din jî pêwîst in. Li ser lêçûyiyên şer hîn tu xebatên kûr û hûr çênebûne û hinek kanên ji bo şer bi kar tên jî ne di nava bûtçeyê de ne. Lê li gorî texmînan peywirkarên fermî îsal bergidana şer wek barêkî bi 100 trilyon LT'yî (7.5 milyar dolar) dê li bûtçeyê siwar bê. Ev hejmar ji hejmara sala çûyî ku, 60 trilyon LT (4.4 milyar dolar) bû gelek pirrtir e. Qeliştêka wê bûtçeyê 47 trilyon LT (3.5 milyar dolar) bû.

Alikarê Sekreterê Serok Wezîrê Yücel Edil got ku, plana wan heye ku, xebateke berfireh li ser mesrefên şer çêbikin. Dewleta Tirk 120 ezar leşker û 40 hezar cerdevan li herêmê bi cih kirine, ji bilî mesrefê wan, hin diravên taybetî (xeynî mehmiziyê) dide 180 hezar karmendên li herêmê. Buhayê melzemeyê şer (çek û ambûr) mesrefê operasyonên leşkerî hin zêdetir e. Li gorî texmînan tenê nêzî 13 trilyon Lira (970 milyar dolar) li operasyonê ku sala çûyî li bakurê Iraqê pêk hat û mehekê ajot çû. Sala bê bi hinek hewldanên Tirkiyeyê ji dawî lê anîna PKK'ê, dê ew mesref hîn behtir bibe. Tiştên di rojevê de ne ev in: Zeximkirina sînor bi qereqolên nû, gihandin û ajotina nav şer ya hêzeke taybetî, li ser sînor kîşandina tîlên bi elektrîk, bi kar anîna detektoran û hwd. Çillerê got: "Di gel ku ev lêçûyîna qeliştêka di bûtçeyê de

mezin bike dîsa jî xeynî perçiqandina PKK'ê tu rê li ber me nîn in."

Li Tirkiyeyê rêjeya (nisp) enflasyonê ya salekê ji sedî 67 e, li gorî hejmarên texmîni qeliştêka (açîk) bûtçeyê 93'yan dê bigihîje 120 trilyonê ku, ev jî nêzî ji sedî 10'ê Dahata Giştî ya Neteweyî ye.

PKK'ê bi revandina 19 turîstan û bombekirina hinek cihên turîstîk li rojavayê Tirkiyeyê berê xwe da sektora qezencdar ku 4.5 dolar jê dihat, zirarek din a mezin da aboriya Tirkiyeyê. Li gorî gotîna Çillerê dê di vê sektorê de milyarek dolar zirar bigihîje aboriya Tirkiyeyê. Jiyan a aborî li herêma şer ku, heya niha zêdetir 10200 mirov lê mirine jî, li ber hilweşînê ye. Sekreterê Giştî yê Menzela (Odeya) Ticaretê ya Sêrtê Tefvîk Nalbant dibêje ku, krîza aborî bi Şerê Kendavê dest pê kiriye. Nalbant wiha dom dike: "Xwedîkêd û xwedîsaman tev

bi hev re ji Herêmê çûn, ji sedî 70'yê tucar û esnafan dev ji Herêmê berdan çûn." Erîşan geleki karsazên Tirk û biyanî tirsandine. Ji ber vê sedemê firmaya neftê ya DYA'yê Firmaya Mobil'ê di meha Îlonê de xebatên xwe rawestandin. Rêvebirê Giştî yê Firmaya Avakirina (înşaeta) İzoteksan dibêje: "Ji bo meşandina tu xebat û projeyan li vê herêmê amadekariya me nîn e, ez nikarim makîne û personelê xwe bişînin cihekî ku lê ewlekari nîn be." Rayedarên gelek firmayên din jî wek wî difikirin û xebatên xwe yên heyî jî radiwestînin. Ev dever cihê neftê ye, di salê de 4 milyon ton nefta xam jê derdikeve, ji sedî 90 nefta Tirkiyeyê jî wir tê, hejmara berxwarîniyê (tîketim) jî ji sedî 17 ye. Lê astengiyên ewlekariyê rê nadin ku lêgerina neftê çêbe. Şer gelek zirarê digihîne çandîniyê jî.

## Ednan Yasîn casûsî MUSAD le serokayetî Felestîn da

**Nûçeyên Derve:** Lew demey da ke Rêkxrawî Rizgarîxwazî Felestîn xoy amade deka bo ewey pitir le wituwêjî le gel Îsraîl da berew pêş biçe û le dahatûyekî nizîk da binkey xoy bibate şarî Erîxa, lew kate da gewretîrîn metîrsî û sersurman wek reşbayek heldekate ser em rêkxrawe ye.

Dezgay Asayîşî Tunis be hawkariy asayîşî Fransa we le 25 iy Oktoberî rabirdû da tiwaniy yekêk le gewretîrîn kare casûsiyekanî nêwan Îsraîl û Felestîn aşkira bikat. Le encamî pişkinî û lêkolîneweyekî dûr û dirêj da derkewt ke Ednan Yasîn cêgiriy Hekem Bel'awî sefirî Felestîn le Tunis le salî 1989 we deskîsî Îsraîle û bo hîsabî Musad kar dekat.

Ednan Yasîn (48 sal) ke be Ebû Hanî denasrê le mangî Oktoberî salî 1989 da be biyanûy nexoşiy jinekeyewe çûwete Fransa û le wê destî le gel daw û dezgay xefeyî Îsraîl (Musad) tîkel kirdûwe, û le beranberî em karey da le qonaxî yekem da pareyekî miftî wergirtûwe.

Bo carî diwem le salî 1992 da Yasîn çûwetewe Feransa û otomobilêkî corî Rîno iy wergirtûwe ke Mûsad le Elmanya we boy nardûwe. Em otobobîle amêrî zor pêşkewtû iy xefeyî têda hebûwe. Herweha Yasîn dî kursiy le Mûsad wergirtû we ke amêrî xefeyîyan têda şardirawetewe.

Yasîn yekêk lem kursiyaney le jûrî Ebû Mezin (Mehmûd Ebbas) danawe ke endamî Bîroy Karraperandinî RRF e. Şayanî gutine ew amêre casûsiyey naw ew kursiyey be germiy leşî mirov kar dekat û bo mawey 8 sal hîç niwê Kirdneweyekî pêwîst niye.

RRF, lijneyekî lêtojnînewey bo em pîrse danawe bo ewey bizanin em karey Yasîn çî karêkî kirdote serî, û herwiha bizanin be çî corêk kar le rewî aştiy rêk kewtinî Gezze-Erîhay yekem dekat.

Çawdêre siyasîyekan delên renge aşkirabûnî em kare casûsiyey bê ke palî be Yasîr Erafat ewe nabê bo ewey wituwêjî Ta-ba rabigrê.

### Ji YRWK'ê hewldana yekîtiyê

## "Têkoşîna Kurd dibe simbol"

**Welat/ Almanya** -Li ser qetliama Licê û kirinên dewletî Tirk Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) û rêxistin û yekîneyên girêdahiye wê, bi navê "Banga yekîti û tîkoşînê" belavokek belav kirin.

YRWK li ser qetliama Licê ku ji aliyê hêzên dewletê ve hatibû pê, disekine û dide diyarkirin ku di vê vebirîna de hêzên metîngehkar ji gelê Kurd î destvala bi sedan mirov kuştine, malan rûxandine, bi çekên agiravêjî (lavî) mal û mirov tevî zarokên dergûşê sewitandine. YRWK di belavoka xwe de wiha didomîne: "Mêtîngehkariya Tirk dixwaze Kurdistanê bike qad şer. Nivîskarên quncikan ên rojnameyan Tirk ku bi xwe berê politikaya şer a Tirk didine xuyan, diyar dikin ku KT nikare demeke dirêj li hemberî berxwedaniya gelê Kurd li ber xwe bide. Tundîbûn û gefxwarîna di daxuyaniyên generalên Tirk de didin nîşan ku ber bi tîkçûne ve diçin".

YRWK diyar dike ku KT ji roja avabûna xwe ta îro Kurdistan bi rêveberiya taybetî, gerîna awarte û biryarnamayan bi rê ve dibê. "Bi biryara Hikûmeta Fehmî Okyar di 24'ê Sibata 1925'an de li bajarên Mûs, Amed, Dêrsîm, Erxênî, Mêrdîn, Ruha, Siwêrek, Sêrt, Bîlîs, Wan, Culemêrg, Kixê û li Xînuşê ji bo mehekê gerîna awarte (îdareya orfî) îlan kirine" dibêje. Dîsa li serê disekine ku bi wê biryarê bi ser neketine, hikûmet jî kar hatiyê xistin û di bîr serokatiya serokwezîrê wê demê İsmet İnönü de qanûnê "Takrîrî Sikûn" (Rapora Rawestîne) hatiyê derxistin ji bo ku rayeyên pîr mezin bidine hikûmetê, bi hinceta ku Serhildana Şêx Seîd rawestînin.

Bi awirên jêr û daxwaziyên ji ronakbîrên Kurd dawî li belavokê tê: "Têkoşîna gelê Kurd her diçe jî bo gelên bindestî jî dibe simbol. Ev tîkoşîna xurt kiriye ku gelê Kurd bi carekê seferber bibe.

Ji ber vê yekê hemû rewşenbîrên Kurd ên ku li Ewropayê ne em wan vedixwînin ku tîkoşînê hin behtir bilind bikin ku îro li Kurdistanê kiriye ku saziyên mêtîngehkarên Tirk bêrîst bimînin û daxwaz dikin ku peywirên xwe di meşa azadî û serxwebûna gelê me de pêk bînin û beşdarî hemû livbazî û tîkoşînan bibin".

Ev bangî jî aliyê YRWK, YMK (Yekîtiya Mamosteyên Kurd), YXK (Yekîtiya Xwendevanên Kurd), hemû yekîne û endamên komîteyên welêt û saziyên taybet ve hatiyê kirin.

Kesên ku îmze avêtine binê bangiyê ev in:

Lütfü Ballıkaya (Hêvoşkar), Mehmet Önder (Sendikavan), Muhamed Devran (Nivîskar), Mizgîn Can (Endezyar), Murûf Yılmaz (Nivîskar, hêvoşkar), Rebwar Reşîd (Nivîskar, Gerîndeyê Karî Nivîskarî yê kovara Serhildan), Selehattin Canvar (Endezyarê madenê), Selim Biçûk (Zimanzan, Serokê YMK'ê), Selim Ferat (Civakzan, Endamê Lijneya Kargêriyê ya YRWK'ê), Serif Serhanoğlu (Endezyar), Dr. Şefîk Hamdoş (Kîmyager, Serokê Enstîtuya Kurdistanê ya Hambûrgê), Yusuf Serhat Bûcak (Ebûqat), Yusuf Nasro (Nivîskar), Zülfiye Zeybek (Mîmar), Yayla Münch-Bucak (Endamê Hîndekariyê ya Zanîstgehê), Behçet Avşar (Nûnerê Rojnameya Özgür Gündemê yê Ewropayê), M. Emîn Pîncewîni (Helbestvan, lêkolîner), Cotkar Zaxoyî (Nivîskar), Mahmut Abas (Doktor), Mîrhem Yiğit (Hêvoşkar), Mustafa Reşîd (Lêkolîner, Endezyarê Kompitûrê), Dilbixwîn (Nivîskarê Welat û Rewşenê, şair), Oktay Yıldız (Editore Ajansa Kurd-Ha'yê nivîskar), Ali Haydar Koç (Dîrokan), Alan Dîlpak (Hêvoşkar, nivîskarê pirtûkên dibistanê), Ahmet Yıldız (Doktor), Amed Tigrîs (Nivîskar, hêvoşkar), Ali Köylüce (Hêvoşkar, Nûnerê Yekîtiya Elewîyan), Ali Acar (Hêvoşkar), Adnan Çağlı (Civakzan), A. Hekîm Gülsün (Nûçevan), Ahmet Barackiliç (Berpirsiyarê HEB'ê yê Ewropayê kevin), Bêrîvana Dêrsîmî, Emîn Akbaş (Hêvoşkar, Serokê Yekîtiya Êzîdîyan), Ehem Xemgîn (Dîrokan, nivîskar), Fêrgîn Melek (Zimanzan), Husamettin Aslan (Hêvoşkar), Xurşîd Mirzengî (Romannivîs7, Hasan Eksen (Dîrokan), Faik Çiçek (Wenekar, Endamê Lijneya Kargêriyê yê YRWK'ê), Huseyin Nazlikul (Doktor), Huseyin Kartal (Kurdolog, Endamê Lijneya Kargêriyê yê YRWK'ê), Haydar Demirbaş (Endezyarê Topografyayê), İmam Kilic (Rojnamevan), Kerwan Seîd (Endezyar, Nivîskarê kovara Serhildan), Timur Sayan (Dîrokan), J. Espar (Nivîskar, şair), H. Sefqan (Bîrêvebirê Akademiya Huner û Muzîkê ya Kurdistanê), İlhan Kızıhan (Psikolog), Rizgar Cîzre (Nivîskar), Dr. Sadiq Erîm (Dîrokan, şair), Abdullah Uzun (Nivîskarê Welat), Borzoo S. Destgîr (Endezyarê Makîneyê), Abdullah Osman (Teknîsyenê Elektrîkê), Farûk M. Ali (Pisporê Tendurîstiyê), Feyyad Osman (Rojnamevan), S. Harûn (Rojnamevan), Selehattin Çelik (Rojnamevan), Rauf Hesen (Nivîskar), Bedran Hebib (Nivîskar), Rîza Ferec (Şair), Celal Mîrza (Nivîskar), Dara Mehmûd (Nivîskar), Ehem Serifî (Dîrokan), Serwer Mehmûd (Nivîskar).

Ji Mebûsan daxwaziya kerrbûna çekan

# Bila êdî xwîn nerije!

**Navênda Nûçeyan-** Serok û berdevkê parlamentera û parlamentere Sêwazê yê SHP'ê Ziya Halîs, li parlamentoyê bi civîneke ji bo çapemeniyê belavoka xwe diyar kir. Ziya Halîs daxwiyand ku, hemû hikûmetên Tirkîyeyê ta roja îro maf û azadiyên hîmî yên gelê herêmê dane bin piyên xwe, kes kerr û lal mane. Li dijî polîtîqayên dewletê yên bi vî awayî derneketine. Berdevkê mebûsan Ziya Halîs ev bang li hikûmet û PKK'ê kir:

"Em parlamentera herêmê ku ji aştîya civakî re li çareyan digerin û hewl didine xwe, bang li PKK'ê dikin ku li herêmê dev ji livbaziye û xwe yên çekdarî û tun-


**P**arlamenterên ku bi koka xwe Kurd in û ji partiyên ji hev cihê ne, di 10'ê Cotmehê de li parlamentoyê li hev kom bûn û belavokek weşandin. Bi vê belavokê 33 mebûs, hem deng li PKK'ê û hem jî li Komara Tirk kirin ku çek neyên teqandin û ji bo çareserkirina gelemşeya Kurdî dev ji azîne (metot) yên tundîxwazî û pestîyê ber din.

diyê û li desthilatê jî dikin ku li hember daxwaziyên maf û azadiyê dest ji livbaziye û pestîyê bikişîne. Wateya domandina van kirina hem ji gelê Kurd re û hem jî, ji gelê Tirk re behtirbûna hestirên çavan û rijandina xwînê ye. Daxwaznameya hîmî ew e ku, çek bîr kerririn û xwîn bê rawestandin."


Belavoka ku ji hêla 26 mebûsên ku ji Kurdistanê û 7'ên ku bajarên Tirkîyê hati-

ne hilbijartin, hatiye amadekirin, wê ji Serokkomar Süleyman Demirel, Serokê Meclîsa Tirk Hüsametîn Cîndorok, Serokwezîr Tansu Çiller, wezîr, mebûs, Serokê Dadgeha Qanûnê Bingehîn û ji sazîyên dewletê yên xwedî paye re bê şandin.

Ev mebûs cara pêşîn ji bo çare dîtina ji gelemşeya Kurdî re, di 2'ê mehê de bi beşdariya 23 mebûsan cara din ji di 5'ê Cotmehê de bi beşdariya 18 kesên civîn wan



Ercan Karakaş



Ziya Halîs

pêk anîn, lê parlamentera DEP'ê (Partiya Demokrasiyê) vexwendiyê civînan nekirin û bêyî wan çalakiyên xwe didomînin. Parlamentera ku îmze avêtine belavoka weşandî ev kes in:

Abdûmelîk Firat (DYP), ji RP'ê İbrahîm Halîl Çelîk, Fetullah Erbaş, Ahmet Dökümez, Hüsametîn Korkuta, Kazım Ataoğlu, Mukadder Başgeçmez, ji SHP'ê Ziya Halîs, Erdal Koyuncu, Sînan Yerlikaya, Kamer Genç,

Mehmet Gülceğün, Mustafa Kul, Adnan Ekmen, Salih Sümer, A.Kerim Zilan, İbrahîm Gürsoy, Celal Kürkcüoğlu, Mehmet Alp, Mustafa Yılmaz (Melet), Mustafa Yılmaz (Entep) Esat Canan, Ali Tutu, Abuzer Tanriverdi, Bahattin Alagöz, Güler İleri, Salman Kaya, Cemalettin Gürbüz, Mehmet Kerimoğlu, Ercan Karakaş, ji CHP'ê Athilla Hun, û ji ANAP'ê li ser navê mebûsên Kurd Şerif Bedirhanoglu.

## Yaşar Kaya bernedan


**Navênda Nûçeyan-**Yaşar Kaya, Serokê DEP'ê û Xwediyê Özgür Gündem'ê, di roja 8'ê Mijdarê de li DED'a Enqereyê ji ber axaftinên xwe yên di kongreya PDK-Iraqê û li bajarê Bonnê hate darizandin. DED'a Enqereyê biryara domîna girtimayîna Kaya da û doza wî avêtin 7'ê Kanûnê

Serokê DEP'ê Yaşar Kaya tevî çend endamên Lijneya Rêveberiya Navendî ji ber belavoka bi navê "Ne şer çareya çemokratik/A niha aştî" jî hate darizandin. Doz, bi mabesta ku li dijî yekitiya millet û welêt propaganda kirine hatiye vekirin. Ji ber ku hin kesên "bersûc" beşdarî dozê nebûn, dadgehê biryara talûkîrîna jî bo 23'ê Kanûnê da. Di dozê de ji Kaya re 10, ji endamên Lijneya Rêveberiya Navendî re jî 5 sal ceza tê xwastin.

Piştî doza der barê kampanyaya aştîyê de, danê êvarê jî li Dadgeha Ewlekariyê Dewletê ya Enqere (DED-E) ji ber axaftina xwe ya di kongreya 11. a Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê (PDK-I) û bajarê Bonnê de hate darizandin. Dîsa bi hinceta ku di axaftinên xwe de li dijî "Yekitiya neteweyî û ya welêt" propanganda kiriyê, li gorî Qanûna Têkoşîna bi Terorê re, xala 8/1 doz lê bebûye û heta 10 salan hepis û 200 milyon cezayê diravî jê re tê xwastin.

Kaya di parêznameya xwe de diyar kir ku, hin parçe ji axaftinên wî hatine derxistin û li gorî wan der mafê wî de doz hatine vekirin, heke temamiya axaftinê bê vekolîn tê de tê dîtin ku, biratiya gelê Kurd û Tirk hatiye parastin û "dabeşkarî" nekiriye. Yaşar Kaya nivîsara axaftinên xwe jî pêşkêşî lijneya dadgehê kir.

Kaya wîha got: "Li vir ne ez bi tenê tem darizandin, di sexsê min de partiya min jî tê darizandin. Dek û dolabî di ximê Tirkî-



Yaşar Kaya

veyê de hene, ji komareke bi vî rengî demokrasî nayê xwestin."

Bi berdewamî Serokê DEP'ê Yaşar Kaya parêziya xwe kir û bi bira lijneya dadgehê xist ku dozger bi çavê organa PKK'ê li Özgür Gündem'ê dinihêrin, bi pendî (êşkere) bi lêv dikin û wî jî bersiva ku hewce kiriyê daye wan. Kaya li ser sîncarkirina "dabeşkarî" iyê jî rawestîya û wîha got: "Dabeşkarî di wateya herî teng ev e ku, mirov ji yekkeriyê keriyekî veqetîne. Li holê yekkeritî nîn e ku dabeşkarî hebe. Tê gotin ku ev e em 1000 sal in birayê hev in. Ev çî reng biratî ye ku radyo, televîzyon, dibistana yekî heye ya yê din nîn e?"

Di parêznameya xwe de Yaşar Kaya li ser meseleya Kurdî jî rawestîya ku bi tundî û pestê gelemşeya Kurdî çareser nabe û dewlet PKK dike hincet li pêşiya daxwaziyên gelê Kurd ên mafên demokratîk û bendan datîne. Kaya îdia kir ku heta meseleya Kurdî hel nebe, li Tirkîyeyê demokîtîbûn pêk nayê.

Lijneya dadgehê di dawiyê darizînê de biryara hildana rewşa girtinê ya der heqê axaftina Kaya di Kongreya PDK-I'yê de û jî ber peyvîna wî ya Bonnê domîna girtimayîna wî da. Doza Kaya talûqî 7'ê Kanûna 93'yan bû.

## Ji çapemeniya Tirk

### TÜYAP

...Weke sala çûyî îsal jî Fuaraya pirtûkan TÜYAP a ku cejna herî mezin a rewşenbîrî ya Tirkîyeyê ye, dîsa bi şermeke mezin vebû. Vê carê li dewsa ku bi awayekî raste rast êrîş bibin ser Fuarê, pirtûkan ber hev bikin û rê li ber firoştina pirtûkan bigirin, hêzên dewletê metodeke din pêk anîn. Nêzî destpêka Fuarê nûçeyek belav bû, li gorî vê nûçeyê hemû berpisiyarên weşanxaneyan ji TÜYAP'ê namemek girtibûn. Tê de di hate gotin ku divê hemû xwediyê weşanxaneyên beşdar, garantiyê bidin TÜYAP'ê ku ew dê pirtûkên qedexebûyî neyînin Fuarê û nedin pêşandin, kesên ku vê peymanê bidin bin piyan, divê standên wan bê radan.

Piştî lihevciyîna weşanxaneyan derket holê ku, ev name tenê ji weşanxaneya Yurt'ê re hatiye şandin. Li ser vê yekê, xwediyê weşanxaneyan piçekî bi hev şewirîn, her çiqas hinek kesan got ev biryarê dibê sedem ku xwendevan ji pirtûkên vekolînêre bi nav û deng İsmail Beşikçi bîpar bimînin jî, weşanxaneya

Yurtê biryara ji Fuarê vekîşîne da. Li gorî Beşikçi TÜYAP'ê ew garantiyê tenê ji Yurtê xwestiye. Tîrmeha çûyî Dadgeha Ewlekariyê Dewletê ya Enqere jî ber sedema ku bi 15 pirtûkên wî li dijî deshiliyaya dewletê propaganda kiriyê, 4 sal û 8 meh cezayê hepisê û 58.5 milyon jî cezayê diravî da İsmail Beşikçi. Eynî dadgehê 2 sal û 4 meh cezayê hepisê û 4.4 milyon jî cezayê pereyî da xwediyê weşanxaneya Yurtê Ünsal Öztürk ji ber ku, ew pirtûk weşandine.

Ev tişt tenê nîşandar e ku mekanîzmeya çavdêriya (konrola) li ser bîr û baweriyên gihîştîye kîjan radayê, çawa bi berfirehî belav bûye û destê xwe dirêjî her derê-heta fuara pirtûkan jî dike. Di vê mijarê de bi gihîştî ez wek Beşikçi difikirim. Ev tişt ji bilî siyek li ser pirtûkan ne tu tişt e. TÜYAP'ê bi vê yekê rûyê xwe reş dike. Bi rastî ev qedexekirin nîşan dide ku, em çiqas karin bi awayekî jêha-

tî û gihîştî bi pirtûk û bîr û baweriyên cihere re mijûl bibin. De werin em rewşa Tirkîyeyê bi gihîştî binin ber çavên xwe.

Ev rastiyeke gelek zel e ku, Dadgehê Ewlekariyê wek bermayiyên Mehmedîyên Leşkerî raye hene ku wek Dadgehê Engizîsyonê pirtûkan qedexê bikin, fermanên berhevkirinê bidin û bi gotinekê pirtûkan jî holê rakin. Dîsa ew karin nivîskaran biavêjin girtîgehê û cezayan bidin wan, bes ji ber ku wan ramanên xwe nivîsîne.

Gelek şermî hene, pîr caran dijwar e ku, mirov wan tiştan liberrabûn pêwîst e, kifş bike. Ji bo hizra demokratîk têkoşîn divê. Îro ev şerm bi TÜYAP'ê re derket holê, lê em gihîştîyan ku ev şerme hemûyan e. Ji bo demokrasîyê û hilweşandina diwarên lipaşmayînê divêtiyek pîr, bi şer heye û heke pêwîst bê, divê mirov derkeve li hemberî engizîsyonê jî.

**Turkish Daily News,  
G. İsmet İsmet, 8'ê  
Mijdarê 1993**

## PKK'ê li Ewropayê riç veda

PKK'ê pêşî li Almanya û Swîsreyê, dû re jî li hemû wêlatên Ewropayê riç veda. Li Ewropayê jî klubên sporê heya bi komeleyên alikariyê, bi gelek navgînan PKK'ê hembêz dike.

Yekaneyên îstixbaratê yê Tirkîyan li ser vê yekê raporek amade kir û pêşkêşî serokwezîra Tirkîyeyê kir. Li gorî vê raporê li Almanya, li herêma Osnabruck û li nav daristanê Siegen hinek

kampên (bargeh) PKK'ê jî bo hêvotina teorîk hatîne dîtin.

Tê gotin ku, li Almanya, Fransa, Belçîka, Austurya, Danîmarka û İngiltereyê 170 nunêrgehên PKK'ê hene. Xebatên ERNK'ê (Enîya siyasî ya PKK'ê) jî li İngiltere, Belçîka, Holanda, Swîsrê û Almanya hene.

**Ji rojnameya Hürriyetê**

Bermahiyên dîroki yên Kurdistanê li nav destû piyane

# Dilê Îsa ji axurê dewaran bûye gova pêz

Dagirkerên Kurdistanê ne tenê dijminatiya gelê kurd kirine. Lê bi kiryarên dirinde bi ser hemû gel û hindikahiyên li Kurdistanê dijîn ve çûne û bi awireke xweperestî li hember wan cih gitine û bi çavekî biçûkdîtinêli wan nêrine. Lewre ew ne tenê dijminên gelê Kurd in. dijminên hemû hestên biratiyê. ol û ayinên asimanî. dijminên hemû mirovatiyê ne.


Li başûrê Kurdistanê, di serdema hikûmdariya dagirkeran de rewşa hindikahiyên wek Asûrî, Keldanî û hwd. ji ya Kurdan ne baştir bû. Gundên wan ji wek yên Kurdan hatin xirabkirin, dêrên wan ji wek mizgeftên me hatin kavilkirin, nasnameya wan a neteweyî ji hate standin û bi darê zorê pirtûk û dîroka wan hate windakirin.

Keldanî mezhebeke filehî ye ku, li gorî gotina Keşeyê Zaxo Polus Hena nifûsa wan li Başûr 40000 hene. Pêtirê wan niha li Bexdayê û bajarên Iraqê rûdinin li dora 7000 an li Zaxo dimînin. nifûsa wan roj bi roj kêmîr dibe. ji ber ku gelek kes ji wan berê xwe didin bajarên Ewrûpayê. Her wisa di sa keşê dibêje: " Li devera Zaxo û Dihokê 34 gundên me hebûn, di her gundekî de

**L** i başûrê Kurdistanê, di serdema hikûmdariya dagirkeran de rewşa hindikahiyên wek Asûrî, Keldanî û hwd. ji ya Kurdan ne baştir bû. Gundên wan ji wek yên Kurdan hatin xirabkirin, dêrên wan ji wek mizgeftên me hatin kavilkirin, nasnameya wan a neteweyî ji hate standin û bi darê zorê pirtûk û dîroka wan hate windakirin.

dêrek hebû, hemû di dema Sedem de hatin kavilkirin û xerab kirin. Dêrên me bi dînamît û TNT'ê di ser hev de hilweşan din, hinek ji wan bermahiyên 1500 salî bûn. Pirtûkên me dîroka me tev hate şewitandin. Zorî li namûsa me dikirin û em bi zorê dikirin Erebb. wisa ji dîdan nasîn."

Yek ji wan gundên Keldaniyan gundê Bêdarê ye. nêzî kilometro-yekê ji bajarê Zaxo dûr e û li rojavayê bajêr dikeve. Cihê gund bilind e û rûbarê Xebûr di ber re dibî-



Diya Ciwan di dema mihricanê de

hure xwediyê erdekî rastgeh e ku, ji bo çandinê bijûn e, li cihê gund hinek avahî hatibûn avakirin leşkerên Sedem tê de rûdiniştin, di gund de dêrek heye ku hîn niha ji li pê ye navê wê Liba Işoê ango Dilê Îsa ye ew dêr kiribûn cih û axurê dewaran, hestir û qantirên xwe tê de xwedî dikirin.

Dû re 100 malên ku di gund de hebûn, tev bi zorê ji gund derxistin, xaniyên wan xirab kirin û niha ji 30 mal ji wan li Zaxoyê dimînin. Bi vî awayî parêzkarên Dilê Îsa jê

dûr xistin û Dil di nava kul û derdan de hiştin.

Dilê Îsa di sala 1930'an de li ser şûn û warê Dêra Mar Şimon ku jiyê wê 800 sal bûn hatiye avakirin. Li ser rûyê hûkmê Sedem, Îsayê ku ji bo aşti û mirovatiyê hatibû biçarmîxêkeşan (lixaçdan) û hilawestîn, Dilê wî di nav êş û janê de hiştin. Gelo niha halê wî çî ye?

Keşe Polus dibêje: " Piştî serhildana 1991'an çêbû, Kurdan darê hikûm bi dest xistin, em pîrr kêfxweş bûn, em girnîjîn û careke din veger hate ser lêvên zarokên me, me paçeyên azadiyê vekirin û li benda bayê wê man, me got hew em tepe ser dibin. Em dê vegerin, gundên xwe ava bikin, zevî û erdên xwe heşîn bikin û li warê xwe xwedî derkevin. Ev e sê sal borîn, me daxwaz ji parlamentoya Kurdistanê kir, her wisa me serî li Mesud Berzanî ji da, ku delîve bidin em careke vegerin gundên xwe. Dibêjin baş e, di radyo û televîzyonan de piştgiriya vê yekê dikin, lê heta niha tiştê nekirine, pîrsgirêka erd û zeviyan çareser nebûye. Mînak gundên Bêdar, Qerewila, Pêşabur û Dêrebûn hemû gelên din tê de niştêcih bûne û em nikarin wan jê derxin. Em dixwazin her tişt bi riya qanûnê çareser bibin û her kes bi aşti û dadmendî bigihîje mafên xwe. Me daxwaz ji

**D** ilê Îsa di sala 1930'an de li ser şûn û warê Dêra Mar Şimon ku jiyê wê 800 sal bûn hatiye avakirin. Li ser rûyê hûkmê Sedem, Îsayê ku ji bo aşti û mirovatiyê hatibû biçarmîxêkeşan (lixaçdan) û hilawestîn, Dilê wî di nav êş û janê de hiştin. Gelo niha halê wî çî ye?

qeymeqamê Zaxo kir, wî bersiva me da got ku, em bêjin wan gelan da ji gundên me derbikevin û em ji herin ser gundên xwe. Me ji got ku, dewlet ew in û heke ew nikaribin derxînin em dê çawa derxînin? Her wiha dêra me ya gundê Bêdarê ku ji bo me cihekî pîroz û peristinê ye, di dema Sedem de bûbû axurê dewaran, niha ji bûye gova (gom) pêz."

Dema me niştêcihên gund, yên niha pîrsyar kirin, dan xuyan ku heke qanûn ji wan bixwaze, ew amade ne ku ji Günd derkevin û wî li xwediyên re bihêlin. Em hevî dikin ku hikûmeta herêma Kurdistanê hemû kêmasiyên xwe serrast bike û Kurdistanê Azad bibe dibistana azadî û serbilindiya mirovatiyê.

## Bang ji bo Meşa Azadiyê ya YRWK'ê

Rûmeta mirovahiye ya ku gelê Kurd bi berxwdana xwe ya bêrawestî diparêze, li dijî metingeriya dewleta Tirk û artêşên wê yên hov, ên ku bi sedsalan e mirovên Kurd dikin kole û kesitiyan wan didin bin piyan, wê bi ser keve.

Bi vê bîr û baweriyê em bang li hemû rewşenbîran dikin ku beşdarî Meşa Azadiyê ya YRWK (Yekitiya Rewşenbîrên Welatparêz ên Kurdistanê)ê ku, ji Parlemantoya Almaniyayê heta Parlemantoya Ewrûpayê ango Ji Bonnê heta Brûkselê ye bibin.

### -Komîteya Meşa Azadiyê-

\* Meş wê di 23'yê Qanûnê de li ber Parlemantoya Bonnê dest pê bike û di 4'ê Çileyê 1993'yan de dê li Brûkselê li ber Parlemantoya Ewrûpayê biqede. Kesên dixwazin beşdarî Meşê bibin, karin serî li vê navnîşanê bidin: YRWK, Maxstir. 50-52 53117 Bonn.




Evîna berxwîdar tune  
Louis Aragon  
(Helbestvanê Fransî)

# Ziman di berîkê de!

## Anîs

Muhammed Qazî yek ji mezintirîn û bi zewqirînê wergêrî Îran e ku çirok, roman û nivîsarên vekolînî yên dinyayê enz herî bi nav û deng ji Fransî kiriye Farisî. Qazî Kurd e û ji Mehabadê ye û ji malbata Qazî yên Mukrî ye. Ew mixabin bi Kurdî naniwîse, ji ber ku nizane, lê her gav bi şanaî behsa Kurdbûna xwe û dewlemendiya çanda Kurdî dike û cend pirtûk jî der barê meseleyên Kurdan de nivîsiye û wergerandiye.



Muhammed Qazi

Qazî ku ji ber xatirê nivîsinên pîr şîrîn û her wisa bi edeb û mirovdostiya xwe li Îranê yek e û mîna qehremanekî xwedan wire (ezim) û xoşewîstê hemû dilan, bi navê "Dewê delal" û "Zorbayê xwecihî" hatiye nasîn û ji aliyê hemû ronakbîr û gelê remekî ve xwedî nîrx û îhtîram e.

Ew ku gelek devxweş û bersivhazir e carekê bîrewerîyeke (xatirayeke) xwe ji bo min got ku, vê di pirtûka "Bîreweriyên wergêrê" de ku beşek belav kir, lê belê ji ber sansûrê beşa din nehat belavkirin de, cih digirt.

Qazî, 20-25 sal berî niha ji bo başkirina nexweşîna şêrpenceyê (qanserê) ya gewriyê çû Ewrûpayê û li nexweşxaneyekê raket. Doktor jê re dibêje: "Divê tu ameliyat bibi û di dawiyê de beşek ji hencereya (têlên

deng ên gewriyê) te were jêkirin. Ji bo vê ameliyatê tu hazir î?" Qazî bi wireyeke pîr dibêje: "Belê, ez amade me ku her niha jî ameliyat bibim." Doktor dibêje wî: "Lê belê baş bihizire! Çimkî tu piştî ameliyatê edî nikarî bipeyivî." Qazî bersivîna: "Min ziman hebe an nebe jî, ne girîng e, lewre li welatê min tu heqê kesekî nîn e ku biaxive!"

Doktorên hazir hemû jî vê bersiva rind re mat dimînin û, "Aferîn" jê re dibêjin..

Qazî piştî "Soreşa Îslamî" jî careke din diçe wê nex-

weşxaneyê. Doktor wî nas dike û bi rûkenî û devlikenî jê dipirse: "Ey mamoste! Niha ku we şoreş kir û Şah nemaye, tu çawan î? Aya tu hez nakî ku zimanê te hebe ku tu biaxivî?" Qazî ku bi alkariya navgîneke (haceteke) taybet dipeyivî, zehf bi hemdê xwe bersiv didê: "Na xêr! Niha divê giştî Îranî bi Erebî xeber bidin. Ez jî nizanim. Vê carê zimanê min hebe an nebe çî ferq dike? Niha jî zimanê xwe dixim beşka xwe."

Û radihêje navgînê, dike beşka xwe.

## KÊ ÇI PEKAND?

Di nav dewletê de 996 kesên ji PKK'ê hene

Serokwezîra Tirkîyeyê  
Tansu Çiller



## Ena lolo ya, lêlê menda.

Rojana rojê, yew Tirk û yew Kurd, yew qeza qerekoldê Tiraqya di têhet di Eskerey kenê. Rojê qumitanê qereqolî veynda erdê nobedarî dano, vano:

Enê celbanê eskerîya berî bidî filenkesan wa berê dewon o vilakê! Ero nobedar başnanê nigandê xwi (xo) dano pero, vano:

Serî ser Qumitan û wede (ode) ra vejîyeno. Ero ca nobedar di vatişê qumitandê xwi enê Tirk û Kurdî resneno, vano:

Enbazên! Qumitan vano wa enê celbanê eskerîya berê dewan o vilakê. Roj o bîn şefeqê coserra eno Tirk û Kurd qerekol ra vejîyenê raşt vera xwi danê rayidê dewan. Xêlêk rayîdsiyayîş ra pey, Tirk his kenî ki betiliyawo. Tirk xwi pîze di fikirîyeno ki yew dekî bi enbazê xwi nê Kurdî ro virazo. Tirk vano: ez go (do) Kurdî ra vaja bê ma yewbînî wegîyê. Eg mi ti weş ronî, miyanedê mi ser o ti yew deyri vajî. Ki deyra to qediyay, naro ti mi wegênê ez miyanedê to ser o yew deyri vana. Senî hawa bibo Kurd Tirkî baş nêzano. Deyra ki vajo zî dirê qalî. Ki nobi hamey mi ez go yew deyra dergî vaja û xwi rê mirdî Kurdî wenişî. Tirk xwi pîze di fikirîyayîşê ena deki ra pey, Kurdî vano.

Enbaz! Kurd vano: Belê, Tirk vano: Bê ma yewbînî wegîyê Kurd vano:

Başo. Lakim senî hawa? Ma senî zanê ki ma çiqas weybînî wegroto? Tirk vano:

Eg mi ti wegrotî, ti miyanedê mi ser o yew deyri vajî. Eg deyna to qediyay, naro ti mi wegênê ez miyanedê to ser o yew deyri vana. Kurd tikê xwi pîze di fikirîyano vano: wule ez go verê jê wegîya. Deyra Tirkî go kirri bo. Go se vajo, yaylar, yaylalar ponc deqey ra pey, go deyra jê biqediyoy. Ki nobi hamey mi, ez go dest bi deyra Hesenê Mûsoy dika. Kêmasêy nê se'etê romena. Ez go mirdiya xwi Tirkî weşîna Kurd, Tirkî ra vano:

Enbaz! Ez verê to wegêna. Ki deyra to qediyay naro ti mi wegî. Tirk vano:

Başo. Kurd, Tirkî vegêno. Tirk dest bi deyra yaylari keno, vano.

Yaylalar yaylalar, ay akşamdan açta gel, dilo dilo yaylalar. Wel hasil ponc deqey ra pey, deyra Tirkî qediyana. Noba wegrotîşî yena bi tirkî. Naro Tirk, Kurdî wegêno. Kurd senî ki miyanedê Tirkî wenişeno, ca di dest bi deyra Hesenê Mûsoy keno. De deyra Hesenê Mûsoy nêqediyana. Nabên ra xêlêk west vîreno. Tirk hewniyeno ki deyri nêqediyana. Tirk, Kurd ra vano:

Enbaz! Kurd vano: Çi? Deyra to nêqediyay? Kurd vano:

Nê, Ena loloya, hama lêlê menda. Tirk ca di Kurdî xwi miyanî serra roneno, vano:

Nê enbaz, nê. Ne ez to wegêna, ne ti mi wegî. Beso. Kurd vano.


Ti zanê. Kêfê to yo.

**Mihem Hîmbêlij**

## Jûjî...

Doğan Güzel

\* BI DARÊ ZORÊ DEWLET DIXWAZE BI GELE MÛŞÊ XWEPEŞANDANEKÊ LI DJÎT PKK'Ê ÇÊBKE... ARMANC; XAPANDINA RAYAGIŞTÎ YA TIRKÎVÊ Û DINYAYÊ YE.



Li Ewrûpa li dijî têkoşîna gelê Kurd

# Hevkariya MÎT û BND'ê

**Welat/Almanya-** Li dijî qirkirin, hingavtin û operasyonên leşkerên dewleta Tirk, Kurdên li Ewrûpayê protestoyên girseyî pêk anîn. Ev protesto di roja 4.11.1993'yan de pêk hatin. Piştî livbazyên Kurdan jî, dewleta Almanyayê, angoyê Polisên Krimînal ên Federal (BKA) di hemû komele, ofîs û malên welatparêzên Kurd de kontrol pêk anîn.

Polisên Alman di operasyonên xwe de bi awayên hovane deriyên welatparêzên Kurd dişikandin, êrişî ofîsan dikirin û di malan de li ber çavên zarokên Kurd teror pêk dianîn.

Nêzîkî 450 hezar Kurdên ku ji ber zilm û zora dewleta Tirk, ji ber qirkirin û talanê reviyane û hatine Alman-

yayê bûne penaber, li vê derê jî bi terora polisên Alman re rû bi rû dibin û li vê derê jî, ji gelek standardên însanî bêmaf in.

Almanya ji Kurdan çî dixwaze? Gelo Almanyayê jî di şerê qirêjî ya ku dewleta Tirk li hember Kurdan dimeşîne de bi dizî cih distîne? Dema mirov diroka Almanya û Tirkiyeyê dikole, tê xuyan ku, ev 150 sal in bi hev re di gelek waran de hevkarî kirine. Tirkiye di dema Adolf Hitler de ku hemû cihan li hember rejîma wî ya faşîst di şer de bû, piştigiriya xwe ya ji bo Almanyayê qut nekiriye û hevalbendiya Hitler kiriye. Dema mirov vê yekê dinirxîne tê xuyan ku Hitler ne besebeb gotiye: "Atatürk mamosteyê min e".

Îro hejmareke bilind Kurd li welatên Ewrûpa yê dijîn. Malbatên hemûyan jî li Kurdistanê an di şer de ne, an hatine kuştin û an jî di girtigehan de ne. Li Licê gelê me, lêzîmên ew Kurdên li Ewrûpayê tene kuştin, Ma gelo ev Kurdên li Ewrûpayê ne mirov in, dilê wan naşewite, naêşin, kîna wan mezin nabe? Tevî van hemû yekan, dikare bê gotin ku, Kurdan di şerê jî li welatên Ewrûpayê tişteq nekirine. Li Koln'ê 40 hezar Kurd bi xwepêşandaneke meşiyên, li dijî ofîs, konsolosiyên Tirkiyeyê livbazyên pêk anîn. Gelo protestoyên bi vî rengî ne mafê Kurdan in?

Li ser van protestoyan Wezîrê Karên Derve yê Almanyayê K. Kinkel, "Emê PKK'ê qedexe bikin", Wezîrê Karên Hundirîn Konther, "Em livbazyên bi vî rengî napejirîn", Serokê Dewleta Almanya Helmut Kohl, "Ev mirovên krimînal (sûcdar-qatil) in", dibêjin. Baş e, tanq û topên kê îro gelê me dikujin? Polisên taybetî yên Almanyayê (GSG 9) jî ber çî timên taybetî yên Tirkiyeyê perwerde dikin? Îstixbaratên Tirkiye û Almanyayê çima piştî serdana Çiller a Almanyayê hevkarîya xwe zêdetir kirin? Birêz Helmut Kohl, tu ji Kurdan çî dixwazî?

Di Cotmeha 1993'an de ajanseke Almanyayê raporeke bi dizî ji me re bi rê kiribû. Di vê raporê de tê diyarkirin ku, kontrgerîla û MÎT a Tirkiyeyê li ser sê (3) bingehan dixwazin li dijî PKK'ê şere bikin: 1-Kontrgerîla

stratejiya xwe ya li dijî PKK'ê diguherîne. 2-Kontrgerîla stratejiya xwe ya li dijî kom û rêxistinên Kurd û Tirk bi rê dixê û hêza wan xurt dike. 3-BND (Îstixbarata Almanyayê) û MÎT hevkarîya xwe bi hêztir dikin.

## ENCAM

BND'ya Alman her dem raporên ku li ser Kurdan hatine amadekirin dide îstixbarata Tirkiyeyê. Çûyîn û hatina endamên MÎT'ê bi awayekî periyodî tî sazîkirin. Di raporên ku didine îstixbarata Tirkiyeyê de, navên politîkvanên Kurd ên li Almanyayê, otomobilên wan, navîşan, faks û axaftinên di telefonan de yên ku ji aliyê BND'ê ve tene guhdarîkirin û tesbîtîkirin, hene. Em dikarin bi nimûneyekê vê rewşê baştir bidin diyarkirin. De mîjûya 29.10.1993'yan de heyeteke parlamentaran ji Almanyayê ji bo çavdêriya qetliama Licê diçin Tirkiyeyê. Rêxistineke Kurd navê van parlamentaran bi faksê ji rojnameya Özgür Gündemê re bi rê dike. Dema ku ev heyet digihîje Diyarbakirê, waliyê Diyarbakirê dibêje: "Min dizanibû ku hûn ê werin" û faksê nîşanî wan dide. Ev mînak jî baş nîşan dide ku, Almanya hemû telefon û faksan kontrol dike û hemû agahiyên ku bi dest dixê dide Tirkiyeyê.

## ARMANC Û HEDEFÊN DEWLETA ALMAN Û TIRKIYÊYÊ ÇI NE?

Almanya ji NATO'yê delamet (wezîfe) girtiye ku, bi taybetî li dewleta Tirk xwedî

derkeve. Îro di NATO'yê de Almanya berpirsiyarê Tirkiyeyê ye.

Almanya di pêşketina îndustriyê de, li cihanê bûye duyemîn û kedxwariya xwe ya li Kurdistanê jî didomîne.

Bi êrişên ser malbat, komele û rêxistinên Kurdên li Almanya û dewletên din bitirsînin, da ku piştigirî û alîkariya têkoşîna nekin. Dixwazin têkoşîna rizgarîxwaz a Kurd û PKK'ê wek "terorîzm" û "terorîst" lanse bikin, ev hemû yek jî bi armanca ku xeberên diplomatîk ên Kurdan li welatên Ewrûpa rawestînin tene kirin.

Tevî van kirinên xwe, her dem tişteqî jî bîr dikin. Gelê Kurd jî mîj ve ye ku bi kuştin, hingavtin, qirkirin, bêkeshîştin û hwd. ve rû bîrû maye.

Ev cara yekemîn e ku gelê Kurd jî bo rizgariya xwe derfetekê bi dest xistiye. Baş e de gelê Kurd jî çî bitirse û xwe jî vê derfetê bike?! Metoda tirsandinê bi ser nakeve, lewre Kurd riya jîne ji xwe re dîtine û dizanin ku ji bo wan berxwedan jîn e.

Împeryalizm çî azîne (metod) û komployan pêk tîne bila bîne, lê de hîn bibe ku gelê Kurd dev ji namûs û şerefa xwe, ji têkoşîna xwe bernade.

Almanya hê jî têngihîştîye ku tu xêr di dewleta Tirk de nîn e. Divê baş bifikire ku, de sibehê bi rêberên gelê Kurd re ji bo danûstandina gelek tiştan li ser maseyê rûnin. Em Kurd bêkînin, lê her tiştî jî ji bîr nakin!

## ROJEVA WELÊT

### Împeryalizm, şer û Kurdistan

**T**êkoşîna şerê rizgarîxwaz a Kurd û şerê ku dewleta Tirk li hember vê têkoşîna li dijî hemû qaydeyên însanî dimeşîne, her roj hinek din belav dibe û bandora xwe ya di qada navneteweyî de jî zêdetir dike. Rojva welatên bi vî şerî re tîkildar, her roj hinek din bi vî pîrsgirêkê ve tê dagirtin. Ev jî dike ku rîsta wan a di vî şerî de bê munaqêşekirin û ev rist (rol) bi awayekî vekirî ji raya giştî re bê diyarkirin.

Îro bi awayekî vekirî tê zanîn ku dewleta Tirk, şerê qirêjî yê li Kurdistanê, bi alîkariya împeryalizmê dimeşîne. Her sal, bi sedan trilyon Lîrayê Tirkan, li vî şerî diçin û ev pere hema hema bi qasî butçeya giştî ya dewletê yê salekê ye. Û tê zanîn ku Tirkiye bi serê xwe nikare ji binê vî barî derbikeve. Di vî şerê ku her roj bi dehan zarok, jin, xort û kalên Kurd dadîqurtîne de, piştigirî Tirkiyeyê yê herî mezin jî Almanya ye. Almanya bi alîkariya dravî û çekî ya ku bi Tirkiyeyê re dike, bûye aliyekî şer û her roj bi kirinên xwe, cihê xwe yê li hember gelê Kurd zexim dike.

Dewleta Alman, di kontrolkirina Rohilata Navîn de, bi Amerîkayê re di pêşwaziyê de ye û dixwaze serkêşiyê bike. Bi vî armançê jî, dest diavêje pîrsgirêkên herêmî û van pîrsgirêkan li gor berjewendiyên xwe bi kar tîne. Bi saya pîrsgirêkên bi vî rengî jî, dikare dewletên weke Tirkiyeyê bi temamî bixe bin kontrola xwe û hêza xwe ya li herêmê xurttir bike. Di nav îstixbarata Tirkiyeyê de jî xwedî hêzeke mezin e û di kuştina hin mirovên navdar de navê dewleta Alman jî derbas dibe. Li aliyê din di hêvotina (perwerdekirina) kontrgerîlaya Tirk de jî xwedî rîsteke taybet e.

Îro ev dewleta împeryalist, li nav erdên xwe jî hember sazî, komele û kesên Kurd şerekî dijwar dimeşîne. Metodên ku di van kirinên xwe de pêk tîne jî, rûyê wê yê rast bi temamî eşkere dike. Sazî û komeleyên demokratîk ên ku li gor qanûnên Almanyayê hatine avakirin û penaberên ku ji ber zilm û qetliamên Tirkiyeyê reviyane, yekser bûne hedefên dewleta Alman û her roj bi êrişeke polisên vî dewletê re rû bi rû dibin. Operasyonên ku dimeşînin jî, li dij qanûnên wan bi xwe ne û xuyaye ku Almanya jî weke Tirkiyeyê di şerê ku li hember Kurdan dimeşîne de tu qayde û qanûnên ku mafên însanan garantî dikin nas nake.

Almanya tewra xwe ya li hember têkoşîna Kurd eşkere kiriye û bûye wek aliyekî vî şerê qirêjî, ji ber vê yekê jî divê xwe li gorî encamên vî rastiyê amade bike, an na rewşa xwe ya îro ji nû ve ji ber çav derbas bike.

## B û y e r ê n B a ş û r

### Artêşa Tirk gundên Başûr jî dişewitîne

**Welat/ Zaxo-**Roja 8'ê Mijdarê, saet li 3'yê êvarê ta 11'ê şevê, li derdora Zaxoyê bêrawestîn dengê gurme gurma bombe û gulleyan dihat. Hate hînbûn ku ev deng û gurme gurm jî firoke û balefirên Tirkiyeyê yên ku di ser asîmanê Zaxo û derdora wê re difiriyên, derdiket. Heta serê sibehê çûnehatina balefir û firokeyên Tirkan berdewam kir. Du heb ji wan di ser Zaxo re desbas bûn, dû re çiyayên gundê Tinatê bombebaran kirin. Li gor gotinên gundiyanê Neruh, balefirên komara Tirkiyeyê şeva 7'ê Mijdarê gundên Ziravkê, Neruh û Sergirka gullebaran kirin. 5 mal ji gundê Neruh hatin sewitandin. 7 gundî hatin kuştin û 2 kes jî birindar bûn. Çend malên ji gundên Zizaskê, gund hiştin û çûn. Her wisa li gor gotinên gundiyan di 7'ê Mijdarê de leşkerên Tirkan bi tanq û topan amadekariya operasyonê dikirin û ber bi Avaspî diçûn. Tê zanîn ku haziriyên Tirkan li gundên Girtê û Bilaka hene û di 7'ê Mijdarê de topên ku dihatin avêtin, ji Girtê û Meydazên di-

hatin avêtin. Dîsa roja 7'ê Mijdarê çend leşkerên Tirk bi hinceta ajotina dewsa PKK'ê, li devera Berwarî navçeya Kanîmazî ketin nav axa Başûr. Li gorî jêderkên pêşmergeyan, heta niha tu ziyar çênebûne. Ji aliyê din ve dewleta Tirk, rayedarên Başûr jî operasyonê agahdar nekiribûn; piştî agahdariya pêşmergeyan, wan jî rayedarên hikûmeta Başûr agahdar kirin.

Şeva 6'ê Mijdarê saet li dora heftan grûbek qaçaxçî, li rasta gundê Durnayê ketin kemîna leşkerên Tirkan. Leşker bi balafirqewêr û narinçokan (bombe) bi ser wan ve çûn, qaçaxçiyên ji ji bo parastina xwe leşker gullebaran kirin. Tu zahiya qaçaxçiya çênebû, der heqê zahiyeatên leşkeran de tu agahî nîn in.

Li aliyê din roja 8'ê Mijdarê Sofêrên erebeyên Bakur ketin grevê. Li İbrahim Xelîl (Xabûr) li dora 600 erebe ji ber zordariya Qeymeqamê Silopiyê derbasî vî navçeyê nabin. Qeymeqam dixwaze ku zorê bide şofêran da ku, kes derbasî Başûr nebe.



Serokê Giştî yê Komeleya Kurdên Sovyeta Berê Yura Nabiyev

# “Armanca me afirandina azadî û yekîtiya gelê me ye”

**Destpêk di rûpel 1. de:** peydekirin. Di nav axa Azerbeycana Sovyetê de li Kurdistan Sor (li Kelbecar, Laçîn, Kubatlu, Zengilan û Cebrailê) otonomî dan Kurdan. Kadroyên di pileyên celeb bi celeb de ji bo Kurdan hatin amadekirin. Dibistanên pîşengî (meslekî) yê bilind hatin vekirin. Di van dibistanan de ji bo ziman û wêjeya Kurdî mamoste dihatin amadekirin. Di folklorê Kurdî de pêşketinek çêbû. Li hemû komarên Sovyetê folklorê Kurdî di pêşandanê de çendî car di rêzên pêşîn de cih ji xwe re veqetandin. Di navbera salên 1930-40'an de ji bo Kurdan demeke dijwar dest pê kir. Kurdistan Otonom hilweşiya. Hejmareke mezin ji Kurdan durrandî şafirên (stepên) Asyaya Navîn. Ew dibistan û navendên çandê ku berê hatibûn avakirin, hatin belavkirin. Bi tenê teq tûk navendên çandê li Ermenîstan û Gurcîstanê man.

Ji salên 1960'ê bi şûn ve di politikayên ku li ser Kurdan dihatin meşandin de nermiyek xwe da der. Lê ev yek tîrî çareserkirina gelşên çandî, civakî û siyasî yê Kurdan nekir. Kurd ji hev belawelayîbûn û ji ber ku di nav wan de tu hevkarî nîn bû, mecbûr mane ku li 9 komarên Sovyetê bijîn. Rewşa ku dixwestin ew di nav xwe de bibişefin (asîmîle bikin) hebû. Politikayêke ji bo yek netewe, yek gel a şaş dihat meşandin û çespanandin. Yanê gelê Kurd mîna hin gelên din bi gorî siyaseta afirandina neteweyêke çêkirî dikirin.

Bi destpêkirina pêvajoya Prestroika û Glasnostê ev rewş rawestiya. Pişt re gelemşeyên neteweyî derketin pêş. Rêxistina me îro bi hikûmeta Rûsyayê re têkiliyan dixwaze bi pêş ve bibe û ji bo çaredîtîne ji gelemşeyan re di kêferatekê de ye. Bawer dikim ku ji hin pîrsgirêkan re em dê careyan bibînin.

**Hûn der barê bûyerên navbera Yeltsin û parlamen-toyê de çi difikirin?**

-Li YKSS'ê û li Rûsyayê nakokî, lihevixistin û bûyerên dijwar diqewimin. Bermahiyên pergala kevin jî, ji navê tîrî rakirin. Di dewsa wan de ekonomîk-politikayên nû tîrî bicihkirin. Hin ji pêvajoya gelemşeyên neteweyî û îlankirina serbixwebûna neteweyan didome. Hişyarbûna gelan bi hemû hêza xwe ve berdewam e. Ji vî aliyê ve tu nermiyek di nav nakokî, dubendî û pevçûnan de çêbûye. Têkoşîna



Yura Nabiyev endamê Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê

desthelatî di nav hemû rêxistin, partî û blokan de didome. Qewmînen di meha Cotmehê de hemû ji van têkoşîn û pevçûnan derketin. Gelê Rûsyayê îro li bûyerên ku berê qewimîne, dinihêre û ji bo ku ew bûyer careke din neqewimin li dû politikayên nû ne. Li Rûsyayê kes nizane wê çî bi çî awayî biqewime û bûyerê de li ku derê rawestin. Emê ji gavavêtînen politikî ji nêzik ve bişopînin.

**Îro li Tirkîyê di navbera PKK'ê ya ku têkoşîna rizgariya neteweyî dide û artêşa Tirk de şerek heye, li ser vî şerî ramanên we çine û tu pêşniyarên we der mafê rawestine şer de hene?**

-Bêşik, em li cem têkoşîna gelê Kurd a welatparêziyê ne. Em li nik gelê me yî ku çek li dest e û têkoşîna serxwebûnê didin in. Bi milyonan Kurd li ku dijîn ew bi navê xwe ne, îro hêviya xwe bi PKK'ê ve girê dane. PKK bûye sembolê têkoşîna rizgariyê û serxwebûna gelê Kurd. Di dîroka gelê Kurd de ev cara pêşîn e ku bi lehengiyê, bi berxwedanê û bi têkoşîna serxwebûnê ku dimeşîne, yekîtiya gelê Kurd afirandiye. Kurdistan yekker e û rasteqîniya wê nayê înkarkirin.

Komara Tirk di vî zanava Kurdî binase, divê mafê çarenûsiya gelê me bipejirîne û riayetî peymanên navneteweyî bike. Lê belê li cihê ku KT (Komara Tirk) wan bike radi-be gelemşeyê bi azîneyên tundî çareser dike. Bêwate ye ku KT vî politikayê bimeşîne. Di qadên navneteweyî de dikeve zorahiyên. Di hejmara kesên ku li têkoşîna Kurdî bi dilxwaziye dinihêrin de zêdahiyek çêdibe. Nêzîkahiya rêxistinên navneteweyî yê durrî çareseriyê kiriye ku, gelê

Kurd li hemberî kirinên artêşa Tirk rû bi rû bimîne. Ev rewş jî dike ku bûyerên xwînî biqewimin û xwînê jî bêhtir bibe. Komara Tirk bi azîneyên tundî û zorê ve dixwaze bi milyonan kes bikuje ku ev jî ne gengaz e. Ji KT'ê re rîya duyemîn dimîne. Bi rîya hevdiştînan çareserkirina meseleyê. Ev yek li gorî berjewendiya gelê wê ye jî. Heke ku li gelê xwe -gelê Tirk- dirame divê vî bike.

**Hûn dikarin li ser konferansa dawî ku we pêk anîbû nixînekê bikin?**

-Konferans di navbera mêjûya 1-5'ê Îlona 1993'yan de li Grasnadarê pêk hat. Bi beşdariya delegyên ji Gurcîstan, Azerbeycan, Ermenîstan, Qazakîstan û Federasyona Rûsyayê çêbû. Dema ku di navbera Kurdên Sovyeta Berê de yekîtiyek çêbibe, gihîştibû. Rûxiyîna (hilweşîna) Sovyetê bi xwe re nefîkirina Kurdan jî anî. Gelek arîşe (problem) derketin rastê. Ev e ji bo ku di nav Kurdan de yekîti û tifaq pêk bîn, bi hev re bi rê kevin û ji bo pêkanîna hevkarîyê di nav Kurdên ji hev belavbûyî de, me pêwistî bi konferansê dit.

Li ber delegeyan peywira danîna yekîti û rêxistinê hatibû danîn. Ji nû ve bidestxistîna otonomiyê ku ji Kurdan hatibû standin, wek armanc li pêşiya konferansê hatibû danîn. A niha peywira me ew e ku em van gotinan binin pê. Peywireke me yî hîmî, ya afirandina yekîtiya gelê me heye. Dîsa konferansa me diyar kir ku li cem têkoşîna rizgariya neteweyî ye. Ji bo ku em gişt peywirên xwe binin cih emê bi hemû hêza xwe ve bixebitin.

**Hevpeyvîn: M. Cizîrî/Moskov**

## NÊRÎNEK

### Welatparêzî

Nîzametîn Toğuç

**E**z hezkirina ji welatê xwe deyndarê dewletên dagirker im. Ger ku wan vî zilm û zorê, vî bêxwedaniyê li me nekiribûna, min qiymeta welat nedizanî ta mirinê.

Hezkirina ji welat, ango welatparêzî encama dilovanî û bi rûmetiyê ye. Kesî ku bi kêrî welatê xwe û gelê xwe neyê, bi kêrî welat û gelên biyanî jî nayê.

Îro em di pêvajoyeke wisa de derbas dibin ku, bi tenê hezkirina ji welat, me ji berpirsiyariya welatparêziyê xelas nake. Berî her tiştî divê em neteweya xwe baş nas bikin, nixrên xwe yê folklorî û neteweyî rind fêr bibin, dîroka xwe û nemaze dîroka neyarên xwe qenc hîn bibin û dersan jê bigirin.

Ka guhên xwe bidin pêşiyên xwe çî qewitî û şîretan li me dikin.

**Îro em di pêvajoyeke wisa de derbas dibin ku, bi tenê hezkirina ji welat, me ji berpirsiyariya welatparêziyê xelas nake. Berî her tiştî divê em neteweya xwe baş nas bikin, nixrên xwe yê folklorî û neteweyî rind fêr bibin, dîroka xwe û nemaze dîroka neyarên xwe qenc hîn bibin û dersan jê bigirin.**

**Ehmedê Xanî** jî aliyekî ve dibêje: “Bêceng û cidal û bê tehwir/Qet vî şixulê mekin tesewwir”. Ji aliyê din ve jî Nûbara Biçûkan diafirîne.

**Seidê Kurdî** jî wiha dibêje: “Xwendin, xwendin, xwendin; desthevgirtin, desthevgirtin”, (Di 33 saliya wefata wî de, Xwedê rihma xwe lê bike, cihê wî bihişt be). Hozanê nemir **Seydayê Cegerxwîn** î marksîst, gazî li ol-dar û welatparêzên

Kurdistanê dike: “Heta hûn ava nekin bi rindî/ Li ser rengê boyaxê nebin dubendî”. Ez dixwazim bala we bikişînim ser hinek tiştên din. Binêrin dagirkeran çawa di warê aborî, çandî û folklorî de hêjahî û nixrên me Kurdan mêtîne, eynî bi wî rengî li kesên me yê zanyar, dîrokzan, teolog û filozofan jî xwedî derketine. Mîna **Selaheddîne Eyûbî, Ebu Mislimê Xorasanî, İbnul-Esîr, İbnu Hallakan, İbnu Taymiyye, Molla Goranî û Seidê Kurdî**, (ezê di nivîsareke xwe de li ser Seidê Kurdî bi dorfirehî bisekinim; ka nijadperestên Tirk çî bi serê wî û pirtûkên wî anîne).

Bi vî hincetê ez jî di vî quncikê nivîsarê de wiha dibêjim. Ji Kurdan pê ve dostên Kurdan (ên ji dil) hindik in. Cilên kesên biyanî li bedena me nayên, erê dibe ku caw û qutnî jî xwe re ji derve bikirrin, lê divê em li mala xwe li gorî bedena xwe bidirûn û li xwe bikin. Ez nabêjim pêdiviya me bi kesî nîn e. Lê ku em Kurd piştgirê hev bin û dest bidine hev, em tîr û sertêra xwe hene.



Koçer (Zeynel Çiftçi)

**Du lehengên nemir**



Kawa (Çêlikê E. Remo)

Du dilşewatên welat Koçer û Kawa  
Xwe bi gorî kirin  
Ji bo-felat. We jiyaneke sor berda  
Ser axa Misircê.

**Li ser navê Komek Welatparêz  
Ahmet Serdar**

Rêziman û rastnivîsa Kurdî ya kevneşopîn heye?

# Çend rêziman û rênivîsên Kurmancî hene?

Baran Rizyar

Gelek kes difikirin ku gelek rêziman û rastnivîsa Kurmancî hene. Lê belê ev ditin ne rast e. Rêziman û rastnivîsa kevneşopîn û xebatên li ser rêziman û rastnivîsa kurmancî ne eynî tişt in. Lewra rêziman û rastnivîsa kevneşopîn demeke dirêj (li dor 60 salan), di Kurdiya nivîskî de bi giştî hatiye bikaranîn. Ji aliyê pirraniya rewşenbîr, zimanzan, nivîskar û hwd. hatiye pejirandin: li ser wê bingehê ders hatine dan; gelek xwendekar li ser wê bingehê bi Kurdî fêr bûne; gelek mamoste derketine; gelek pirrtûk, kovar, rojname, ferheng û hwd. hatine weşandin. Ev giştî wateya tecrûbeyeke mezin. Ji lewre mirov jê re dibêje rêziman û rastnivîsa kevneşopîn. Ji aliyê din ve jî, gotina rêziman û rastnivîsa Celadet Bedirxan divê bi ferehî were ravekirin. Celadet Bedirxan pêşengê wê xebatê ye; lê belê, yek jê di wê demê de keda gelek nivîskar, rewşenbîr, zimanzan û hwd. jî ketiyê û ya dudan jî ji wê demê heta niha ev rêziman û rastnivîs hatiye bikaranîn; ji lewre bi sedan nivîskar, rewşenbîr, zimanzan û hwd. jî pê tîkîl bûne.

Îcar li jor me got ku ji bilî ya kevneşopîn xebatê li ser rêziman û rastnivîsê hene. Ev xebat şexsî ne û li ser bingeha wan tu pêvajoyên nivîskî tune. Lewre mirov nikane wan û rêziman û rastnivîsa kevneşopîn têxe qategoriyekê. Ew di vê demê de tenê pêşniyar in. Jixwe ev xebatên li ser rêziman û rastnivîsa Kurdî jî du beş in:

a) Yên ku rêzimana kevneşopîn wek bingeh pejirandine û xwestine ku li gora ditina xwe kêmasiyên ku tê de ne tije bikin. Ango xwestine ku ya kevneşopîn pêşve

**Divê minaqeşe li ser wek bingeh qebûlkirin an qebûlnekirina rêzimana kevneşopîn dest pê bike. Ji wê paşdetir tu cihên ku mirov lingê xwe bi xurtî bide ser tune. Divê xebatên ku me li jor di xala (a) de qal kirin, ji bo pêşvexistina rêziman û rastnivîsa kevneşopîn bibin alîkar. Yên xala (b) divê berê ji aliyê xwediyên xwe ve, li gora bingeha rêzimana kevneşopîn werin pêşçavkirin û dû re wek alîkar werin bikaranîn. Heke ev kes vê nekin, wê gavê ji divê me qane bikin ku rêzimana kevneşopîn ji bin ve pûç e, li ser hîmên çewt e**

bixin.

b) Yên ku weke ku rêziman û rastnivîseke kevneşopîn tunebe, li Kurmancî kolane û xebata xwe bi xebatên 60 salan re tîkildar nekirine. Bê guman, ev tewre xebat rîskeke mezin bi xwe re tînin û li gel wê jî, rê li minaqeşeyên bêdawî vedikin. Lewre di zimanekî de bi hezaran eleman hene û em nikanin giştan ji nû ve minaqeşe bikin. Yek jê hewce tune. A duduyan, ew dikane minaqeşeyê têxe holeke vala û rê li gelek zimanên nivîskî veke. Li her derê din-yayê û ji bo her zimanî weha ye; carekê bi giştî û kolektîfî li zimên tê kolandin û bingeha rêziman û rastnivîsê tê afirandin. Paşê di pêvajoya bikaranîna zimên de, ev bingeh li gor hewcedariyên nû û kêmasiyên kevî tê pêşvexistin.

Îcar gava ku em bersîva pîrsa ku çend rêziman û rastnivîsên Kurdî hene din, divê em van rastiyan bidin ber çav. Wê gavê jî diyar dibe ku tenê rêziman û rastnivîseke Kurdî ya kevneşopîn heye. Ev jî ya ku bi pêşengiya Celadet Bedirxan hatiye amadekirin û jê vir de aliyê Kurmancîaxêfan ve hatiye bikaranîn e. Ewên din xebatên li ser rêzimana Kurdî ne, ne kevneşopîn in.

**DIVÊ MINAQEŞE JI KU DEST PÊ BIKE ?**

Divê minaqeşe li ser wek bingeh qebûlkirin an qebûlnekirina rêzimana kevneşopîn dest pê bike. Ji wê paşdetir tu cihên ku mirov lingê

xwe bi xurtî bide ser tune. Divê xebatên ku me li jor di xala (a) de qal kirin, ji bo pêşvexistina rêziman û rastnivîsa kevneşopîn bibin alîkar. Yên xala (b) divê berê ji aliyê xwediyên xwe ve, li gorî bingeha rêzimana kevneşopîn werin pêşçavkirin û dû re wek alîkar werin bikaranîn. Hek ev kes vê nekin, wê gavê jî divê me qane bikin ku rêzimana kevneşopîn ji binî ve pûç e, li ser hîmên çewt e. Heta ku vê nekin, berpîrsiyariya wan e ku xebatên xwe li ser wê bingehê ava bikin. Divê li ser vê bingehê ji bo pêşniyaran bang were kirin.

Piştî van gavan mirov dikane ji beşdaran qomîteyekê saz bike, demekê bide qomîte û piştî wê demê ji wan pêşniyaran giştî bipê. Dû re ev pêşniyar divê werin minaqeşekirin û ji bo encamên wan minaqeşeyan li erêkirina giştî kovar, rojname, weşanxane, dezgehên Kurdî û zimanzanan (ev biwêj bi xwe babeta minaqeşeyekê ye, li vir mebesta min kesên ku li ser zimên xebatên wan ên berçav hene ye) were gerandin. Divê

di vê pêvajoya minaqeşeyê de, hemû weşanên Kurdî li ser bingeha rêziman û rastnivîsa kevneşopîn derkevin. Ev pîr girîng e. Ji xwe qasî ku ez dizanim, pîrrianiya wan li ser vê bingehê ne; cudatiyên ku hene ne bingehîn in û ev ji me re avantajek e. Divê mirov ji awayê "Rewşen"ê dûr bisekine; ew li tu pîvanan nayê. Niha di destê min de hejmar 9,10 û 11 hene. Di van hejmaran de du elfabe, du rêziman û du rastnivîs hatine bikaranîn. Giştî nivîsan bi alfabe, rêziman û rastnivîsa kevneşopîn hatine nivîsin, le belê yê birêz F. Huseyn Sagnîç bi alfabe, rêziman û rastnivîseke bi giştî cuda hatine nivîsin. Bêguman mafê birêz Sagnîç heye ku pêşniyar û rexneyên xwe bi rêzimana kevneşopîn bîne zimên. Lê belê, rexne û pêşniyaran wî weşandin tiştê e, ji bo wan kovareke ku li ser navê MKM'ê derdikeve, ji elfabe, rêziman û rastnivîsa kevneşopîn averê kirin, bi du tewre elfabe, rêziman û rastnivîs weşandin tiştêkî din e. MKM dixwaze ji bo Kurdên Bakur bibe sazgeheke neteweyî. Sazgehên ne-

teweyî xwediyên qîmetên netewe yên kevneşopîn in. Ew nikanin bêyî erêkirina giştî, ji wan averê bibin. Hek bibin, wê sazgehêna xwe di şikê bixin.

**DIVÊ XALÊN MINAQEŞEYÊ ÇI BIN?**


Helbet xalên minaqeşeyê wê ji pêşniyaran pêk bînin. Li vir, divê mirov giraniyê bide kes û dezgehên ku ji kevî ve bi belavkirin, pêşvexistin an hînkirina Kurdî re mijûl bûne. Wek mînak: Mamosteyên Kurdî û wergêr, berpîrsiyarên weşanxane, kovar û rojnameyên Kurdî û nivîskarên Kurdî, hwd. Lewre wan fersend ditine ku di pratîkê de çavdêriya avantaj, dezavantaj û kêmasiyên rêzimana kevneşopîn bikin. Divê xala pêşîn pêşvexistina termînolojiya rêzimanê ya kevneşopîn be; divê ew di demeke kin de were amadekirin û minaqeşe li ser wan terman were meşandin. Eger em vê nekin, bastir e ku em bi zimanekî din minaqeşe bikin. Lewre roj tune ku di vî warî de termên nû neyên çêkirin. Di vê enflasyona termên rêzimanê de, ez pîr bişik im ku emê bikaribin hevdu fêhm bikin. Termên rêzimanê pîr girîng in. Lewre ew ravekirinên rêzimanê jî dihundînin. Ji ber vê yekê, çewt navlêkirina wan dikane xesarê bide rêzimanê, an jî tîgîhaştina rêzimanê dijwar bike.

*jî weşanên Kurdî*

## Romana Siya Evîne û wergera Erebi

Di koça wî ya ji welat û vir ve evîna Ferîha û Kurdistanê di dilê wî de her dem bi germî dilipike. Siya xerîb û xurbetê, siyêke gelek giran bû li ser Memdûh Selîm Begê Wanî. Ew naxwaze li dûrî welatê xwe bimîne û bersîva zabitê Fransî dide: "Heleb dîsa ji welatê min dûr e, ez bi hevî me hûn min li nêzikî welatê min bihêlin, li gel gelê min bihêlin". Lê dewleta Tirk zor dide ser hikûmeta Fransa ku tu Kurd li nêzikî sînor nehêlin. Ev çî zeman e? Koç li piştî koçê, ji Antakyayê ta bi Heleb û Qamişlo, koç ber bi Şamê ve ta bi Beyrûdê, lê koça Mehdûhê Selîm Begê Wanî koçeke cihêreng bû. Bîranîn bixwîn, bîranînên li Wanê û xebatkarên kovara "Jîn". Lê dem hatiye, divê siwarê hespê koçkirinê ji hespê xwe peya bi be. Payîza jîna dawî ye. Ew koç dike, lê koçekî bi sîn û bêdeng û hêmin bû. Ew diçe goristana nemiran.

Ev e piçek ji romana Mehmet Uzun, Siya Evîne ye ku mîrze Tewfîq Huseynî li Sûriyeyê li bajarê Amûdê wergerandiye Erebi, bi zimanek û şeweyekî serkeftî û jêhatî. Ev roman ji bo xwendevanên Erebi da pejirandin.



Romana Siya Evîne bi tîpên Erebi

## Kovara Lazan

Li Tirkîyê Lazan kovareke çandî weşandin. Kovara ku bi navê "OGNİ" hate weşandin li ser asîmîlebûna Lazan û rewşa wan a koçberiyê disekine. Kovara OGNİ 48 rûpel e û zêdehî 10 rûpelên wê bi zimanê Lazkî hatine nivîsin. Di kovarê de, alfabeza Lazkî hatiye dayîn û der heqê vê alfabeza ku ji 35 tîpan pêk hatiye xwendevan tî agahdarkirin. Kovar sêhane ye û li Stenbolê tê çapkirin.

**OGNİ**  
KÜLTÜR DERGİSİ  
YAZDA BİR ÇIKAR  
FİYAT: 3000 TL  
KASIM 1993

SKANI NEBİL!

- KENDİNDE / KENDİN OLMA BİLİNCİ ÜZERİNE DÜŞÜNCELER
- DİL, KÜLTÜR, KİMLİK SORUNUNA KISA BİR GİRİŞ
- KAZAKİSTAN'A SÜRÜLEN LAZLAR
- YÜZ YIL ÖNCE SAMEGROLO (MEGRALYA)
- LAZ ALFABESİ
- NENAPONA

Di jiyana Kurdan de

# Stranên feqî û keçikan

M. Zahir Kayan

Di dîroka Kurdistanê de medrese, mele û feqî, cihê girîng digirin. Ev rastî îro jî beyan e. Em dizanin ku di vê dîrokê de rewşa xwendinê û zanistiyê bi van medreseyan kifş dibe. Gelê Kurd di van medreseyan de dixwand û tiştên baş hîn dibûn, ta niha gelek mirovên hêja û bi rûmet di van medreseyan derketine. Ev rastî di pirtûka Şerefxan de ya bi navê **Şerefname** de diyar e. Di vê pirtûkê de (ev pirtûk wisa jî dîroka Kurdan a kevin e) der mafê medreseyan de gelek dîtînen hêja hene. Hozanên wek **Ehmedê Xanî, Eliyê Herîrî, Ehmed Melê Bateyî, Feqiyê Teyran** û hwd. giş di van medreseyan de xwendine û kesaneyetiyên bi rûmet derxistine holê. Kevneşopa medreseyan di dîroka Kurdan de, di demeke dirêj de didomin û tên. Jiyana medreseyan di nav gel de şax vedaye û li gorî wêje û çanda Kurdan bingeh girtiye. Di nav gel de mele û feqî pîr bi rûmet dihatin hesabandin. Fekiyên medreseyan mele û feqî û hinek hozanên hêja bûn. Jiyana medreseyan di dîroka me de li gorî xwe hinek kevneşop çêkirine, çend mînak:

1: Feqî berê li gundan mal bi mal digeriyan û zexirê didan hev (rûn, toraq, genim, ardû û hwd.)

2: Gundiyan qîmeteke mezin didane feqiyên û ji wan re hurmeteke mezin dikirin.

3: Feqî di nav gundan de wek mirovên mezin û zana dihatin hesabandin. her tişt ji wan dihatin pîrskirin.

4: Feqî bi pirranî li malên melayên xwe dixwendin û ev bûyer dibû sedema tîkiliyên feqî û kesên gund.

Em îro di nava gelê Kurd de hinek mînakên gotinên gel, der heqê jiyana feqî û keçikan de dibînin, an jî feqî û keçikên meleyen. Di nava gel de bi van nemûşan gelek klam û gotin hatine afirandin û derketine holê. Di navbera feqî û keçikan de klam hatine heyalkirinê, dema em van klamên hanê dinirixînin ev rastî tê xuyan. Ev klaman di navbera du kesan de tene gotinê, yek feqî ye, yek keçik e, an jî keçika mele ye. Keçik tim û car bi bengî ye û wek dengbêjeke bi nav û deng e, feqî jî hozan e. Di stranên wan de xweza û figûrên xwezayê tene ziman. Xuy û xisletên keç û xortên Kurd, hezkirin û nehezkirinên wan, dîtîna û ramanên wan, hevî û bédiliyên wan û hwd. giş di van stranên de ne. Ji ber rewşa feqî û ke-

çikên Kurdistanê, dengbêjên hêja hemû hunerên xwe rokirine û di vê hêlê de gelek berhemên bi rûmet afirandine. Dengbêjan ev kilamên xwe ji jiyana keç û xortên Kurd hildane, her wekî berê û niha li Kurdistanê dema bihar dihat keç û bûk derdiketîne best û beyaran, zozan û çiyayên pincar top dikirin. Wê demê rewşa xwezayê keç û bûkên Kurd dixiste dilîniyêke bêfîfade. Van keçikan kesera dilê xwe, raman û heyalên xwe giş bi van klaman, li van cihên wek bihuşt dianîne ziman. Li gundê **Axedeve Ahmet Çakmak** der heqê klamên feqî û keçikan mele de kilamên xweş digotin. Em dikarin bibêjin ku ev klam yê biharê ne û bi dilxweşiya vê meha xweşik ve hatine afirandin. Di van klaman de hozanî û jîriya

xwe de bibecîne, wisa klam di avêtine ser rêwiya ta ku rêwî biqulibiyana. Van keçikan dîna xwe danê ku çend feqî li hev girtine diçin çiyayê Qolîbaxa, di nava van keçikan de keçikek hebû. Hozaneke bi dilê mirovan bû. Klam avête ser van feqiyên. Di nava feqiyên de jî hozanekî hêja hebû wî û keçikê avêtine ber hev, çika wê ji hevdu re çî bibêjin

Keçikê got:

Min dî keçikê digot:  
"Rêwiyo li rê meçe nelezîne  
Malxerabo qasekê  
Serê hespê xwe bikişîne  
Malxerabo ez nîzanim  
Hûn Ereb in, an Suryanî ne  
Min rebenê."

Feqî got:

"Min dît feqî digot lê lê keçikê

Malxirabê çima tu nîzanî  
Tu keçike bakîre  
Ez jî feqiyekî tehsilê  
Bi serê xwe me  
were bi usûla eşîrê  
Bi şer'a nebî Mihemed  
Min bistîne  
Wî te rebenê"

Keçikê got:

"Min dît keçikê digot feqî  
Dîwarê Qolîbaxa  
Tep be li vî qirî  
Malxerabo Qolîbaxa  
Bişewite dar û dirrî  
Kuro feqî tê bi rîza Xwedê  
Êş û elem li can û bedena min  
keve  
Agaha min li rêwî û recalan  
tune  
Kuro here  
Mala seyda li hêviya we ye  
Darê pirê ma nebirrî

Ezê serê herdu memikên xwe  
Têkime zexme ye  
Li min rebenê.

Feqî zivirî ba hevalên xwe: "Wele heçî li çiyayên Qolîbaxa hêviya min mesekinin, niha seyda li hêviya me ye. Hûn ji xwe re dar û beran bibin, ez û ev keçik em bi hev re ketine gengeşiyê, çika Xwedê çawa dajo li ser mala heqiyê".

Keçikê got:

"Min dît keçikê digot feqî  
îro her kes li devê me dinihêrin  
Weke dînan  
Yê bibêjin feqî çûye  
Berê xwe daye qîzê û jinan  
Malxerabo were yanîş mebe  
Ez te ji mala bavê xwe re nakim  
Panokê ber sergînan  
Wî li min rebenê."

Feqî got:

"Min dît feqî digot keçikê  
Ez ne kerê bavê te me  
Malxerabê ez feqiyek ji  
Feqiyê tehsilê bi serê xwe me  
Malxerabê ez ji devê te  
Heft bavê te zêde me  
Malxerabê ez îşev  
Li gundê we mêvan im  
Wehd bi can û bedenê min keve  
Ez îşev mêvanê taxima  
Deqa şing û berê te me  
Li te rebenê"

Keçikê got:

Min dît keçikê digot feqî  
Qolîbaxa darebî ye  
Gelî feqîno hûnê  
Bi rîza Xwedê bikin  
Hûn nîzanî mala  
Feqiyê min li ku ye  
wî min porkurrê".

Feqî got:

"Min dît feqî digot keçikê  
Qolîbaxa li vê sūsê  
Malxerabê xwe avête  
Perê sūsê nava pūsê  
Malşewitîyê çima tu nîzanî  
Ez li Norşinê li cem  
Seyda dixwînim  
Tu pîrsa mala min dikî  
Li walî Xînûsê  
Weş li te rebenê

Keçikê got:

"Min dît keçikê digot feqî  
Li dîwarê Qerebêjê  
Malxirabo min gul çinî  
Avête pêşê  
Kurapê min bi rîza Xwedê  
Wê were min ji dê û bavê min  
bixwaze  
Eger danê ji xwe danê,  
Eger nedane  
Destê min bigire biavêje  
Mala Şehîdê Nado  
Gundê Kêşê  
Wî li min rebenê".



Wêne: Alî Reşîdî

çikê û xortên Kurd bi rûmet derdikeve holê. Emê niha bi gotina dengbêjê hêja **Ehmedê Hêlik-san** ve çend mînakên ji klamên feqî û keçikan bidin.

Çend feqiyên li mala seyda dixwendin, vêga pîra mala seyda pireke kevin bû, giş bi daran ve hatibû çêkirin, meftengê pireyê rîziya bûn. Rojekê mela gote wan feqiyên: "Kuro ca herin Çiyayê Qalîbaxa hinek dar bînin werin, em biavêjine ser pîra xwe, belkî ser pîra xwe digirin." Feqî li hevdu ketin berê xwe dane Çiyayê Qolîbaxa. Li wir keç û bûkên **Kerboriya** hebûn, ew jî ji bavekî **Cibraniyan** bûn. Ev keç û bûkên han ku dibû bihar derdiketîne pincarê li çiyayê Qolîbaxa digerin û diketin xweşî û gengeşiyê. Çiqas rêwiyan ku di rîyan re derbas dibûn teşbîh nebe mîna pisîka ku mişkekê bixe destê xwe û pê şabe û di destê

Vê newalê kale kale  
Malxerabê lê hêşin bûye  
Qirş û qal e  
Malxirabê çima tu nîzanî  
Ew mîrê ku li rîya derbas be  
Derdê dilê wî kûr e  
Mereqa dilê wî pîr e  
Ji derdê dilê xwe dinale  
Wî te rebenê."

Keçikê got:

"Min dît keçikê digot feqî  
Qolîbaxa darebî ye  
Malxerabo lê diçêre  
Birrek bizin yek jê mîh e  
Gelî feqîno hûnê  
Bi rîza Xwedê bikin  
Nîzanim ev feqînga  
Ezeb e, an bi jin e  
Min rebenê."

Feqî got:

"Min dît feqî digot keçikê  
Qolîbaxa bi tezin e  
Malxerabê lê diçêre  
Birek mîh yek jê bizin e

Li min rebenê."

Feqî got:

"Min dît feqî digot keçikê  
Qolîbaxa li van pala  
Malxerabê kerî û suriyê  
Qolîbaxa giran e  
Qirşa nadime wana  
Malxirabê ez porê te  
Li ser dê û bavê te de kurr kim  
Hevalên te tamam  
Piştîyên xwe kirin  
Tûrê te maye vipî vala  
Malxerabê çawa şivan e, wisa  
jî spez e  
Êvarê berê xwe bidî malê  
Tûrikê vala nav hevalan,  
Wî te rebenê."

Keçikê got:

"Min dît keçikê digot feqî  
Qolîbaxa li kele ye  
Malşewitîyo tu danê sibehê  
Rabe were mala me ye  
Malxerabo ber  
Çay û xwirîniya te ya sibehê

Tevgera Heqe -2-

# Wan jiyaneke hevpar û azad diparast

Niwa Hebîb

Piştî mirina **Şêx Ebdulkerîm (1942)**, hin alîgirên Heqe dev ji civaka xwe berdân. Ên din ji bûn du beş: yek jê dan pey **Hemesûr**, lê pirraniya din li dû **Mamereza** birayê Şêx Ebdulkerîm çûn.

## HEMESÛR KÎ YE?

Hemesûr bi xwe ne ji malbata Şêxan e. Lê belê xizan e. Di dema pêşî de li mala Şêx darkêşî û golikvaniyê kiriye. Piştî standîna îcazeta teîqetê bûye yek ji pêşengên Heqe. Alîgirên Hemesûr li gundê **Kilawqutê** de vera **Şwan (Kerkûk)**, gundê **Qormanxan** û **Qerangwê** li devera Sûrdaş (Silêmanî) bi cih bûn. Wan xwe dan kar û bihêzkirina aboriya xwe. Dev ji çixarekişandin û çayvexwarinê berdan û kincên sade li xwe kirin.

Neyarên Hemesûr dest bi gengeşiya ku Hemesûr bîr û hîzrên sosyalistiyê diwêşîne kirin. Ev yek bû sebêbê ku Hemesûr di sala 1957'an de bê girtin û darizandin. Di pey serketina Soreşa 14'ê Tirmehê ya sala 1958'an, ji zîndanê hate berdan. Niha li Kerkûkê rûdine û wek mirovekî welatparêz û pêşverû tê nasîn û hezkirin.

**Hemze Abdullah** ku sekreterê PDK-Iraqê di salên 50'yî de, yek ji ronakbîrên Heqe ye: der mafê Hemesûr de dibêje ku, Hemesûr û alîgirên wî "**çepên tevgera Heqe**" bûne.

## MAMEREZA (1905-1961)

Birayê Şêx Ebdulkerîm e. Xwendayekî baş û ji dîroka Kurdî bi agah bûye. Di jiyana xwe de gelek car bendîtî, îşkence û zîndan dîtîye. Mirovekî hemdem û bawerpêşketî bûye. Pêgirê xelkê rênçber û bindest bûye. Di dema xwe de di nav kesên navdar de xwedî deng bûye.

Di dema nefkirina wî de ya bajarê Îmareyê li başûrê Iraqê, tîkiliyêke xurt li gel **Mirhac** daniye. Ev pêwendî bû sebêb ku piştî vî yekê Heqehî tîkiliyê bi **Komara Mehabadê** re deyne. Di dema komarê de komek ji alîgirên xwe bi serokatiya Şêx Muhamed Emînê Malhe dişîne Mehabadê. Her wiha tîkiliya Mamereza bi tevgera niştîmaniya Iraqê re jî hebûye.

Bi sebêbê van tîkiliyan û fiheriya bîrên wî, Mamereza gihiştê wê baweriyê ku divê civaka Heqe careke din ji nû ve serûber bike. Bi taybetî jî, ji ber gelek mirîdên Heqe bi sebêbê sadehiya xwe li ser hebûn û tunebûna Xwedê dest bi mijûlahiyan kiribûn. Ku ji ber vî yekê bû Heqe di nav gel de wek tevgerêke ji olê derketî, nav dabûn. Ji aliyê din ve ew nakokiyên navbera alîgirên Hemesûr û Mamereza herese-

Bi taybetî jî, ji ber gelek mirîdên Heqe bi sebêbê sadehiya xwe li ser hebûn û tunebûna Xwedê dest bi mijûlahiyan kiribû. Ku ji ber vî yekê bû Heqe di nav gel de wek tevgerêke ji olê derketî, nav dabûn. Ji aliyê din ve ew nakokiyên navbera alîgirên Hemesûr û Mamereza hereseke (gefêke) mezin li çarenûsa tevgera wan dikir. Ji bilî vî yekê pirsar civakî ku Hemesûr dabû xuyan, bandor li alîgirên Mamereza dikir.



Alîgirên Tevgera Heqe ji bo genci û rindiyê her cure fedekariyê dikaribûn bikirana.

ke (gefêke) mezin li çarenûsa tevgera wan dikir. Ji bilî vî yekê pirsar civakî ku Hemesûr dabû xuyan, bandor li alîgirên Mamereza dikir.

Lewma Mamereza diviyabû bi ramaneke kûr li rewşa Heqe binihêre û bingehêke ramanî, civakî û sincî (exlaqî) deyne, çepereke ku gotegota dijminên wan nikaribin bikevin hundirê wan ava bike. Mamereza gelek ji baweriyên Hemesûr aniye nav civakê xwe, ev jî bû sebêb ku Hemesûr bawerî bi Mamereza bîne û bizivire nava wan.

Bi vî rengî bernameya bingehîn a Heqe hate danîn û ber bi jiyaneke hevpar, azadiya afret (jin), rêbaza (rêça) demokrasiyê bi rêveberiya civakê û dijberiya zordest û xwînxwaran ve, çû.

## PROTESTOYA HEQE YA DUYEMÎN

Di henga Mamereza de bizava Heqe peresî (tekamûl bû) û gelek dever bûn Heqe. Li her hêlê xeber xebera Heqe bû. **Soreşa Barzan** di sala 1943-44'an de dest pê kir. Hikûmeta Iraqê tirsîya û Mamereza di sala 1944'an de girt û şande bajarê **Îmarayê**.

Heqe xanî, mal û zeviyên xwe firotin û ber bi Kerkûkê ve çûn. Di rê de gelek car di navbera wan û polîsan de pevçûn çebûn: gelek kes ji wan hatin girtin. Heqehî li leşkergeheke nêzîkî gundê **Yarwelî** sekinîn. Hikûmet dixwest wan bixapîne û li hêla din ji Mamereza û hevalên wî darizîne. Bû zivistan, nexwesîn kete nav

wan û gelek zar, pîr û kalên wan mirin. Heqehî li hev civiyan û biryar standin ku meşa xwe ber bi Kerkûkê ve bidomînin. Bi zorê ketin hundirê bajêr. Li cihekî vala rawestiyan. Kurdên Kerkûkê avêtin piştê wan û bi dizî ve alîkariya wan kirin. Hikûmet jî vî rewşê tirsîya bi Heqe re li ser çend xalan lihevhatinekê çêkir:

- 1-Vegera Mamereza ji bo gundê wî (**Kelkesimaq**)
- 2-Berdana Heqehiyên dîl
- 3-Bijartina zerarên wan
- 4-Terxan (tehsîs) kirina cihekî taybet li devera **Axceler** an **Bitwên** ji bo Heqehiyan. Zevî bidine wan, xanî, dibistan û nexweşxane ji wan re çêbikin

5-Heqehî biçin devera Şwan ta ku hikûmet ew xalên jorîn bi cih bîne

Mamereza hate berdan û ew şandin **Helebçeyê**. Lê Heqehî li gundan belav bûn ji ber ku mal, zevî û samanê xwe firotibûn, zehf jar bûbûn. Lê careke din dest bi kar û bar kirin. Fetilîn ser rewşa xwe ya berê. Ev meşa Heqe 3 meh ajot, ji Îlona 1944'an heta bi Cileyê.

Bi şertê ku Mamereza neçe tu aliyekî, di sala 1949'an de destûr danê ku vegere gundê xwe. Li sala 1952'yan de Mamereza ji bo cara pêşîn gestek li gundên xwe pêk ani. Mamereza di 25.2.1961'i de li Silêmanî mir û **Kakehemeyê** kurê wî bû peyrewê wî.

## KOSPÊN LI BER PÊŞVEÇÛNÊN HEQE

Weke ku tê dîtin alîgirên Heqe zêdetir wextên xwe bi

xeberdan û hebûn û nebûna Xwedê diborandin. Her wisa ketin ber lîxistina hikûmetê û hundirê zîndanê. Ji ber vî rewşê nikaribûn bernameyêke ronî ji xwe re deynin.

Di nav Heqe de mirovên tîgihîştî û fama gelek bûn, bes xwendeyên wan pîr kêm bûn. Girîngiyê bi xwendevaniyê nedidan, ji bo ku rewşa wan î quncikgirtî destûr nedida mamosteyên biyan bêne gundên wan. Ji ber van kêmasiyan tevgera Heqe ji çend gundên wek **Şedele, Esker, Ser-**

**gelû, Bergelû, Kilawqut, Sermord, Kanîhencîr, Heledin, Şile, Qelaçoxe, Quzlû, Helemord, Bîrespan, Merge, Omergunbet, Qeredere, Rêdar, Kelkesmaq** û çend gundên din derneketin.

## ENCAM

Wekî ku mamoste Hemze Ebdullah dibêje sê tişt bûye sebêbê serketina bizava Heqe li hin deverê başûrê Kurdistan ew jî ev in:

1-Rizgariya wan a ji kot û kelemçe û zilma feodalîyê

2-Azadiya afret li civakeke paşvemaî weke civaka Kurdî

3-Ew alîkarî û biratiya navbera alîgirên Heqe bû ku, li tu devera **Rojhilata Navîn** ne di hate dîtin.

Di navbera salên 1980-88'an de ku zêdetirî 5 hezar gundên başûrê Kurdistanê bi destê rejîma Sedam hatin kavilkirin û sewitandin, pirraniya gundên Heqe jî vala bûn û Heqehî jî di nav bajarên de belav bûn û civaka wan jî hev veqetiya.

\* Yek ji efserên Kurdê Başûr bû di artêşa Iraqê de, di 1943'yan de bi Mele Mistefa re derdikete çiya û dibe pêşmerge. Piştî avabûna Komara Mehabadê (22/1/1946) bi komarê re alîkarî dike. Ji aliyê din ve yek ji damezrênerên PDK-Iraqê bû ye.

## Çavkanî:

1-Awirdaneweyek le bizûtneweyî Heqe. Nivîsîn: Mustefa Eskerî, Mihemedî Melekerîm, Hemze Ebdulah û Dr. Îzedîn Mistefa. Bexda 1983

2-Bo le Heqe kewtne teqe. Rauf Mihemed Zûhdî, Bexda 1984

Werger: Niwa Hebîb, Zana Farqînî

## Bernameya Heqe\*

- 1-Biratî: Heqe hemû xwişk û birayên hev in, ne dewlemen di û jarî, ne cudahiya zayendî (cinsî) wan ji hevdu naqetîne
- 2-Heqperestî: Civaka Heqe û alîgrên wê, pêgirên karê heq in
- 3-Hevparî: Hiç kesekî/ê Heqe ne xwedanî mal, zevî û samanê xwe ye. Mal mala civakê ye, bi emanatî li ba wî/ê hatiya danîn
- 4-Bac: Her alîgirekî/ê an jî malbateke Heqe baca mehane ji bo rêveberiya xaneqê û tekyayê divê bide
- 5-Şêwr û ray: Hemû endamên Heqe ji bo vekolîna tenga siyên xwe li hev dicivin, bêyî cudahiya li navbera jin û mîr
- 6-Azadiya afret: Heqe hemû xwişk û birayên hev in. Jin te vî mîr hevpar e di rêveberiya civakê de. Kec dikare bi serbestî bi dilketiyê xwe re bizewice
- 7-Rewîşt: Her endamekî/ê divê li ser çend prensîban bimeşe û heke ji wan averê bibe jê re tê gotin. "Bêrewîst." Divê ku ew li gorî bêrewîştîya xwe cezayê pereyî bide an jî karekî civakî bike, prensîbên Rewîst jî ev in:
  - a-Pêkanîna fermana civakî
  - b-Pêkanîna kar bi rêkûpêkî
  - c-Xwedûrkirina ji diziyê, derew û ewaniyê
  - d-Paqîjiya bedenî, kinc, mal û xwarinê
  - e-Dûrbûna ji kesên xeyrî Heq
  - ê- Di dema hevdu dîtîne de mackirin nîn e, dest didi ne dest û dibêjin: "Ya kerîm û ya reza"

\*Ev bername bi destê Mamereza hatiye amadekirin û belavkirin. Heqe ji vî bernameyê re dibêjin "Rewîst."

# Dengvedana Şerê Yekemîn ê Cîhanê di wêjeya Kelhûrî de

## Anîs

Rojnameya duhefteyî "Kawe" -ku di salên Şerê Yekemîn de bi zimanê Farişî li Berlînê dihate çapkirin- di rûpelê 8'an de, di hejmara çaremîn a roja sêşemê 5'ê "Aban" a 1285'ê Yezdgirdî (8. Cemadîl-ewel. 1334'ê Hicrî û 14'ê Marsa 1918'ê zayînî), bi sernavê "Şiirên Kurdî yên niştîmanî" şîrekê bi zaravayê Kurdî ya Kelhûrî û bi rênivîsa Kevin Çap Kiriye ku ew jî, ji rûyê rojnameya "Restaxîz" (rabûn) çapa Kirmaşanê û ji şaîrekî bi navê "Delo" hatiye wergirtin.

Naveroka wî şîrî serxwebûnxwazî û niştîmanperweriyeke Îranî ye, li dijî hêzên biyanî yên nav Îranê ku Rûs û Îngilîz bûne û doza yekgirtina gel û "cîhad" kirin bi rêveberiya seydayên olî, dike.

Ev rojname dinivîse: "Her çendî ku em şîr çap nakin, lê belê ji ber tazebûna şîrê li jêr ku bi zaravayê Kurdî ye, bi tenê bi xatirê zimannasiyê û hezkirineke taybetî ya zane û pisporên welatê Freng li şîrên wiha xwecihî ku bi gotinên edîban navê "Fehlewîyat" lê danîne, niha ev şîr li rûyê rojnameya "Restaxîz" ku demek berê li Kirmanşah (Kirmaşan) dihat çapkirin, dinivîsin:

*Dewletê xafil, milletê nadan  
Yekî wa Rûs e, yekî zi Alman*

*Ne dûsî piyas, ne diwîşmine man  
Des we yek biyeken xirawîye man*

*Fikrê bikîn axir, ey weten xahan!  
Diwîşmen girdiye, dewr ta dewriman*

*Gera beme tu ey dewlet Alman!  
Agahî biye we Şahê Îran!*

*Fikrê esasî biket eraman  
Ta neçût le des êstêqlaliman*

*Fikrê bikin axir...*

*Ey milletê Turk! Ey ehlê Êslam  
We pîtan îşum axerîn kelam*

*Yek karî bikîn we şertê tamam  
Ta ke xoşnûd bût rehberê Enam*

*Fikrê bikin axir...*

*We Xuda binalîm le desê Êblîs  
Yek laman Rûsî, yekî Êngilîs*

*We pîtan îşum we qewlê selîs  
Ger dûsî bikîn şewîn hem celîs*

*fikrê bikin axir...*

*Ey xelqê bî qewl! Ey milletê Rûs!  
We z çê rû şewîm we gerdê to dûs*

*To bît ke besayit tûb we Şahê Tûs  
Ger dûsî bikîm şewîm bînamûs*

*fikrê bikin axir...*

*Z xew elesîn ey millet xahan!  
We Xuda binalîm we çowê giryan*

*Ta ke derdiman biket ew derman  
Ey Xuda! Îran çuy le desiman*

*Fikrê bikin axir...*

*Des we yek bibîm, bikîm êttêhad  
We hokm axayan biçîm we cehad*

*Rûhê niyakan le xud bikîm şad  
Bikûşîm axir, her çê bada bad!*

*Fikrê bikin axir...*

*Wateya helbestê ev e:*

Dewleta bêagah û miletê nezan yê me, yek Rûsî ye, yê din Almanî ye. Tixûbê navbera dost û dijminê me ne xuyan e û herdu ji bo kavilkirina bîra me dest dane destê hev. Ka ey niştîmanperwerino! Hizriyekê ji ber xwe bikin, lewre dijmin dor û berê me tev girtiye.

Ey dewleta Alman! Bila rêç ji bo te peyde bikim. Agahdarî bide Şahê Îranê heta fikrekî hîmî ji bo me bîne. Û serxwebûna welêt ji destê me neçe.

Ey miletê Tirk! Ey misilmanino! Niha ez gotîna xwe ya dawîn ji we re dibêjim: Bi hêzeke pirr mezin xebe- tekê bikin û Xwedê ji xwe razî bikin.

Bi Xwedê em ji destê şeytan dinalin. Lewre aliyekî me Rûs e û aliyê din Îngilîz dagir kiriye. Niha jî bi zimaneke sade ji we re dibêjim: Eger hûn dosteyatî li gel wan bikin, hûnê mîna wan bibin.

Ey xelkê bêqewl û biryar! Hûn, ey miletê Rûs! Axir çima li gel we em bibin dost? Her hûn bûn ku bi top li "Şahê Tûs" dan (mebest bi top lêdana meclîsa şûra ya Îranê ye, di dema Muhamed Elî Şahê Qacar de).

Ey niştîmanxwazino! Ji xew rabin! Em niha bi çavên pirr bi rondik di dergahê Xwedê de dinalin, heta ew bi xwe derdê me derman bike. Hawar! Ey Xwedê! Îran ji destê me çû!

Ka dest bidin destê hev û yek bibin, bi fermana seydaya dînî biçin çîhadê (şerê misilmanan li dijî kufrê). Heta bi vê cureyê ruhê bav û kalên xwe ji xwe şad bikin. Em hewla xwe didin niha her çi dibe bila bibe!

## Bi raya hondrawayi, Lejê Hozanwanî û Fêrikê Ûsif

### Farûk Yakûp

Ziwani kitabi a ki êy nûşennu û formole keno. şeno îzeh bike-ro. Waney (wendox) şenê êy xwi di hîs bikerê û sere yê xwi di şeklêno newe bidê û bi formilê newe êy kitabidê îzeh kerdeni. Nûşo nêmerde (hondirawa. raman "roman". istaniki û destani û. a. b) hozanwano nêmerde yo. A ki nûştox keno berz nûşê ci yê. A ki nûş keno berz miyanê nûşî. vînayîş. bi hondiraway a dinya naskerdeni. viliki (Gulî) bi hondiraway a bon kerdeni helbet ferqêno (zey pê nêbiyayeni) zaf gird û çiyeno newe yo. Nêy zî tenya oki şeno bi hondirawa ya (şîr a) bi bermo û bihiwo sena îzeh bikero. "Mi to canê xwi ra vet êy zilim" insan atomî bi ûranyûm ra veceno û petrol ra zî benzîni û zilim zî cane hînsanan ra. Labirê senin? Êy zî tenya bin êşkence dinalêne û fixan kenê şenê vacê û êy ki serê koy û kepiram di. vêşan têşan geyrenê û çimanê xwi yê camerdi. merg vînenê şenê vacê. senîn canî ra zilim merdime şeno veco. Ez bawera yê carmerdi. merg vînenê şenê vacê. se-

nin canî ra zilim merdim şeno veco. Ez bawera ki şima na hondirawa yê Ahmed Arif î nas kerdi. Arif gûnî yê xwi tarîxa ma ra giroto û êy ardo kar û ziwani biyo Tirk î. Labirê Fêrikê Ûsif tarîxa xwi, folklorê şarî (gelê, xelkê) xwi bi zimanê Kurdî elêmino û êy bi ziwane Kurdî zî ano kar, hondirawa yên xwi di.

Dewletanê binan di cayê di hîsanî êy ki ser mayin û sinoran ra ravêrtê benê vilikî surgûni bi zerya yên gûnîn. Ay zeryay ki gûnî virêjênê. Ema vînazî çî camêrdiyê hondiraway û bê ters senîn qirin kenê. Hondirawa yê Fêrikê Ûsif zî wûnî qirin kenê, di alîda rîvan ra. Hasret a êy qandê Kurdistanî û qandê ser biyayeni.

Fêrikê Ûsif ser 1977' di kitabê xwi yê jewin Êrîvan di bi nameya "Narê" çap kerdo. No kitab bi herfe "Kîrîlîkî" (Rûsî) ameyo çapkerdini. Kurdê Sowyeti harfê Kîrîlîkî, Kurdêma yê cêr Soranî harfê Erebi û ma di zî Latîni yeno kar, yanzî anê kar. Fêrikê Ûsif şoreşger o, hozanwan o bewnê se vano kitabê xwi yê "Narê" di.

Li Mozolêya Lenîn

....Belê ew bi xwe jî, ji heyme- ma hişiyar bû kew kire dile, raza çû rehme- niv qurnê sal hat li salê bar bû ew hê şiyar dike dilê alemê

Zey mi cor di zî nûşna Fêrikê Ûsif sûk a Ermenîstan Erîvan di roşeno û zaf kovar û rojnaman di hondirawa (şîr) yên ci weşaya- yo. Heta tayin hondirawa yên ci bi aliyê Aramê Tigran biyê vengê weş, biyê stran. Labirê mi çiyê hesya ku o zî raştî mi eciz kerd û kewta ver o yo ki Fêrikê Ûsif bi çimên xwi yê hoste vîna çiyê nevîno û neweşeya şeker zî biyo derdêno bin.

Nika ser 1993 yo û bi aliya Weşanê Sara (Stocholm/Swêd) kitabê ci yê newe resenc û kewno destê wendê. Kitabê ci yê newe "Hîveron (Şewqî asmî)" bi zehmetey a ame çapkerdenî. Weşanê Sara bi no karê xwi ya zaf alikariyê zimanê Kurd ke. Zaten vaten vernî di zî Dawê Xanê nêy vano.

Dawê Xanê zaf ser hondirawa yê "Hubê Xwedêhiz" vindeno. Û fikrê xwi ser na hondirawa yê vano. Mi bi xwi çî çax hondirawa yê ci yê pelê 27 di

bi nameya "Kanê nameya min?" wend, mi a hondirawa di germey hêşî û bi hezkereden a piya çerçeweya filozofya vîna- ya.

...Min dilê xwe, kire kaxez da destê te, yara min Lê te çima, çima neda bersiva nameya min? Heger bi rastî, tu ji min hez nakî

ez ne di dilkê te da Lê te çima, nameya min li cem xwe veşart û neda... Bawer kena ki heme wenda- ye qandê xwi û qandê wendênî çiyê wendênî çiyê bivîne. Û bawer kena ki "Yar" di, "Rizayê Kurmet" di, "Hubê Xwedêhez" di û "Zikreşiyek" di çiyê wesi xwi di û ciwati xwi bivîne...

Hozanwanê ma yê Fêrikê Ûsif şoreşgerê, hesreter, hezkerdenî û waştênê xwi bi hondiraway a ano ziwani. Elbet no çiyê newe niyo, labirê hozanwan bi hostatî ziwani û herfi ano pê het û gûnî dano edebiyatê ma û o ki ez vîna hosta bi hostatî yê xwi rayê newe akeno "Bi raya hondirawayi, lejê hozanwanî" di.

Beno ki tayna vacê "ziwanê

Fêrikê Ûsif qelso". Vatenê no raşt. Labirê merdim ger e çî yên vîra nekero ki; ziwane bini "0" ra yanî (-) ra ameyo xetê "0" î. Nozî çiyêno zaf muhîm o. Yanî ziwani no Kurdî estbi wastê vîni bikerê û heta heta ame o merhele zî. Ewro Kurdê Sowyet di alfabeya kirilî, Kurdê Iraq û Îran di alfabeya Erebi û cor di ma hetê zî alfabeya latîni yeno kar. Tiya di zî merdim vî- neno dijmin wazeno ziwane ma qels bikerê û heta ameyo o merhele ma hetî hezar a hînaşan nêşenê bi ziwane xwi ya qisey bikerê yanzî binûşnê. Ziwane ma di Erebi, Tirkî, Farsî, Rûsî (Ermenî) û ziwane bini ra zî zaf qisey û vaten kewto miyanê ziwane ma. Helbet no zî xeletê ma nêbi. Dijmin çim sîr, xayîn û bêbext o. Qandê coyo ki, gere ma wêhêre tolerans bê û ser pê nê, pê hetî ma no karê heyat ra muhîtir bicivnê. "Ziwani qels o" rasto, ema gere ziwani tûj û fişing nêbo û ay ki nûş- nenê bi nêya, bi ziwane tûj û ziwane fişing dirbetin nêbê.. Gûnî dayeni, yaremetey dayeni destê ma di ro û gere ma nêy yaremetey nêmiçiqnê ki, gopali nîrê şikyayeni...

# Cejna sersalê û Geliyê Laleşê


**L**i geliyê Laleşê êvara cejnê, pirraniya oldar, derwêş, kal û qewalan berê xwe didine geliyê Laleşê û dema dinya tarî dibe pirraniya mirovên wê derê her yek xwe nizm dikin û berepaş bîst gavan diavêjin da ku pê li fitîlan nekin. Helbet ew hewş hemû dibe ronahî û dimeneke gelekî ciwan pêk tê û li gel vî karî hemû qewl û qesîdeyan dibêjin her ji kalên mergehê (merqed) ta bi belengazan bi vî karî radibin. Domahiyê ew fitîl bi xwe vedimirin. Sibehê zû diçin gundan, kulîlkan bi derê aqîd û avahiyên Geliyê Laleşê vedinênin.

## Îdo Babaşêx

Xelkên welatê me, ji çerxên kevin û dêrîn ve, her ji çaxê Someriyîyan pêşwaziya sala nû dikirin û bi kêf û şahî cejna sersalê pîroz dikirin. Helbet di wê demê de sal ji meha Nîsanê dest pê dikir. Lewre hinek diroknivîs di wê baweriyê de ne ku peyva "Nîsan"ê ji "nûsal"ê, ango sala nû hatiye. Ev bawerîya ku di nav xelkê Kurdistanê de maye, dibe ku di nav gelên din de jî bîne dîtî. Neteweyên Arî jî cejna Newrozê pîroz dikin û ew wek destpêka salê dizanin. Rehmetî **Enwer Mayî** dibêje ku, xelkê me Newrozê wek rojê pîroz dizane û wiha bawerîya dikin ku Xwedê di vê rojê de rizq dabeş dibe. Her wisa birayên me yên fileh jî, li Nîsanê cejna sersalê dikin û wisa diyar dikin ku ev bawerî ji ola filehtiyê kevintirîn e. Lê ew bi xwe jî tevî nizanin ji bo çî xwe di ser agir re diavêjin.

Her wekî keşe (can bavî) diyar dibe, her diya diroknivîsê Erebi **Seîd El Deyweçî** dibêje, cejna sersalê cejneke navçeyî ye (herêmî ye). Lewre Kurdên misilman û êzîdî wisa bawerîya dikin ku, cejna sersalê ji çerxên berê ve maye li nav xelkê me û heta îro jî hatiye. Lewre Kurmancên Êzîdî jî her sal li çarşema serê Nîsana Şerqî cejn dikin û hemû rengên şahî û xweşiyê tê de pêk tînin. Ne bi tenê cil û bergên xwe dixemilînin, xanî û malên xwe jî bi kulîlkan mor û zer, qalîkên hêkan direngînin, her wiha roja beriya cejnê, her malek li gor derfetên xwe jimareke hêk dikolînin û direngînin, helbet beriya cejnê bi rojekê kulîlkan diçin, her wiha her malek xwarineke taybetî ji bo cejnê çêdikin, ji vê xwarinê re dibêjin "**Meswek**". Di vê cejnê de xelk diçin ser gorên mirovên xwe.

Pirraniya van yekan di pirtûka seydayê **Xidre Silêman** a bi navê "**Gun-**



Geliyê Laleşê ziyaretgaha herî girîng ya Êzîdîyan e.

diyati" de jî hatine diyarkirin. Lê ez dixwazim behsa cejna sersalê bikim. Li Geliyê Laleşê êvara cejnê, pirraniya oldar, derwêş, kal û qewalan berê xwe didine Geliyê Laleşê û dema dinya tarî dibe pirraniya mirovên wê derê her yek xwe nizm dikin û berepaş bîst gavan diavêjin da ku pê li fitîlan nekin. Helbet ew hewş hemû dibe ronahî û dimenekî gelek ciwan pêk tê û li gel vî karî hemû qewl û qesîdeyan dibêjin her ji kalên mergehê (merqed) ta bi belengazan bi vî karî radibin. Domahiyê ew fitîl bi xwe vedimirin. Sibehê zû diçin gundan, kulîl-

kan bi derê aqîd û avahiyên Geliyê Laleşê vedinênin.

Êzîdî bi çavê gelek pîroz li vê cejnê dinihêrin û dibêjin, di vê şevê de melekên cihanê hemû têne guherîn û rizqê mirovan di vê şevê de têne dabeşkirin. Her wekî ku rehmetiyê Mayî jî gotî, Kurmancên misilman û êzîdî, ji bo Newrozê dibêjin ku ev cejneke gelek kevin e û dibêjin, nabe ku kes di meha Nîsanê de jinê bîne, lewre Nîsan bi xwe bûk e. Ev jî nîşaneke kevniya vê cejnê ye, lewre li çerxên berê jî, nemaze li çaxê Babilîyan jin li Nîsanê nedianîn û bawerîya wan wisa bû ku

Xudan (Alîha- ilah) di wê hevyê de jin dianîn.

Li domahiyê dibêjin xelkê Kurdistanê ji çerxên kevin û dêrîn ve wê cejnê li hindek guherînên biçûk pîroz dikin. Her çend neyaran, nemaze faşîstên Bexdayê jî bo berjewendiyên xwe û kirêtkirina kelepor û mêjûyê xwestin ku hindek layenên (beş-rax) wê biguherînin jî, lê belê bi ser neketin û mîletê me her wekî xwe ma û hevîdar in ku ev cejn di rojên pêş de xwestir û bi şahîtir bibe. Di sala bê de, li **Singar û Xaniqîn** û Kerkûkê de cejna sersalê bikin û rojên me hemû bibin cejn.

## XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

**Çeperast:** 1-Yek ji parlamenterên DEP'ê. Di wêne de tê dîtîn 2-Dema beriya şevê/ Elementek/ Ling 3-Ji nû ve bi giyankirin/ Celebek mêş, hingiv çêdikin 4-Qarîna dewaran/ Di dirokê de navê împaratorekî Qertacan 5-Cînavkeke veşarî/ Ji vir û pê ve, êdî/ Bawerîya olî 6-Serbest 7-Sot/ Saziyeke Tirk, karê lêgerîna maden û berhemên binerdî dike 8-Navekî mêran/ Cînavka kesane ya yekemîn a pirrehejmar 9-Sembola Îrîdîümê/ Navekî jinan 10-Bihuş/ Heñ

**Serejêr:** 1-Perwerdekarî 2-Ji rêderketî/ Qurban 3-Sewalek ji cisnê seyan/ Giyan 4-Beşek ji zimanê Îndo-Ewropî/ Derece 5-Dê, dayê/ Hergav 6-Pêleke (ceryaneke) wênesaziyê, ji aliyê 4 wênesazên Fransîz ve hatiye avakirin, tu qayde nedinasîyan 7-Destûr/ Nûnerê leskerî yê li welatêkî din 8-Tê de dan dikutin/ Daw 9-Kinnivîsîna Litreyê/ Celebeke dar 10-Ap 11-Madenek 12-Qor

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												



### BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ

**Çeperast:** 1-Gerry Adams 2-Ero/ Enî/ AA 3-Nêzik/ Mîr 4-Penaber 5-Îsal/ Int/ Awa 6-Many 7-Ezep/ An 8-Aîdîd 9-Aza/ Zero 10-Havîn

**Serejêr:** 1-Gençîne/ Ah 2-Erê/ Zaza 3-Rozname/ Av 4-Lapa 5-Yek/ Îzn 6-An/ Piyade 7-Dîmen/ Nir 8-Înte/ Doz 9-Mara 10-Sa/ Ba 11-Xew 12-Mê/ Ra

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmarê ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiye razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkîyê:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyêke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay

Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

**Mercên abonetiye:**

	Li hundir	Li derve
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120-DM

# Hûn Romiyên çiyayî ne

## Şêxo

Hebû nebû, sê gund hebûn. Navê yekê Romiya, ya din Ecemiya, ya dintir jî Romiyan navê wê qedexe kiribûn hîna jî ew gundî newêrin navê gundê xwe bibêjin. Ên dibêjin jî, diavêjin hepsê an jî 900 milyon cezayê pereyî didine wan. Emê ji tirsan bibêjin "Bênav".

Romiya û Ecemiya neyarê hev bûn. Tim li hev dixistin. Cihê şerê wan jî li ser axa Bênavê bû. Cârîna kesî zora kesî nedibir. Herduyan jî dizanibû gundê ku Bênavê bi piştê kê bigire ewê zora yê din bibe. Ji bo vê yekê her tim qasidên xwe dişandin ser Bênavê. Pê re xweş dikirin. Digotin: "Xwedê bike emê alî we bikin".

Salekê dîsa di navbera wan de şer derket. Serokê Romiya Selîm, bi dek û dolabên mezin Bênavê Îdrîs bi aliyê xwe ve xist, zora Eceman birin. Tac û textê Îsmail jê standin. Di vî şerî de Îdrîs bi gelê xwe re xinizî (xayîntî) kir. 40 hezar xortên xwe da kuştinê. Dû re Selîm û Îsmail li hev hatin, erdê Bênavê di nav xwe de par kirin.

Di navberê de gelek sal û dem bihurîn. Li Romiya tengî qewimî, di xwe de e-tirî bûn. Yek ji wan rabû, navê wî Kemo bû. Hat cem Bênavê, got: "Gelî hevalina! Birano! Em ji berê ve şirikê hev in. Îro teng li me qewimiye. Yewnan, cih û bangiya me ji me standin. Zar û zêçên me ji hev bela wela kirin. Lewma divê hûn bi me bigirin. Em li hember neyar şer bikin, tac û textê xwe ji wan bistînin."

Pêşiyê Bênavî bi hev şewirîn. Gotin: "Bextê Romê tune. Ewqas sal e ew ji bo wan şer dikin, carekê jî xêra wan negihaye me. Tim li me zilmê dikin. Xûgiyê ji me dixwin. Divê em jî gundê xwe ava bi-

kin." Hinekan ji wan gotin: "Na. Nika li Romiya teng qewimiye. Em navêjine piştê wan, nabe. Ew jî wekî me îslam in. Em nika gundê xwe ava bikin, ewê bibêjin, "Bênaviyan kêmfersendî kirin". Ev ne şertê mêraniyê ye, ji xwe ew jî soz didine me. Emê piştê gundê xwe ava bikin".

Biryara xwe kirin yek. Piştê Romiyan girtin û bi Yewnanan re ceng kirin. Çi mêrê Bênavan hebin gişt çûn şer. Li gund kes nema ku cot jî bike. Xela rabû. Zaryên wan ji birçînan kelax dikotin. Jinên wan bi çapek tene erdê

Navê wan wê wextê qedexe kir (berê ji wan re digotin Kurd û ji welatê wan re jî Kurdistan).

Kalikekî Bênavê hebû. Alimekî mezin bû, ji rûyê wî yê spî, nûr dibariya, navê wî Şêx Seîd bû, got: "Ev ne heqê Xwedê ye. Me bi we girt, Yewnan ji erdê we kirin der. Girêka we bi paş ket, hûn zilmê li me dikin. Mafê me ji me distînin, ma şirkatî û biratî wiha ye? Kanê ew soz û peymanê we?"

Gel li dorê civiya, li ber zalimên Romê serî hildan.

Kemo bi tanq, top û balefiran ve ajote ser Bênavê. Bajê û gundê

kerên Romê bi tanga wan ve nediketin. Xweşmêrê mêran Seyîd Rîza û hevalên wî xwe dabûn çiyayên Dêrsimê û halan di xwe didan.

Kemo dîsa bi dek û dolaban ew xapandin, got: "Werin Erzinganê em peymanê deynin". Bi bêbextî Seyîd Rîza girtin. Êlên Bênavê yên dora Amedê şandin ser Dêrsimê. Bênaviyan, bi Bênaviyan dan kuştin. Bi rêberiya xîz û bi balefiran bombe li serê Dêrsimê barandin. Ava çeman ji xwinê sor diherikîn. Di şkeftan de gel şewitandin, pîrek, zar û zêç qir kirin.

Bênavî bi dê û bavên xwe re bi zimanê wan nepeyivîn". Hin zarok jî dikirin sîxur, li dû wan dişandin. Bi vî awayî sîxurîti di nav Bênaviyan de zêde bû. Zarokên wan hîna Romîtiyê û ewantiyê dikirin.


Gelê Bênavê cila bêxîretiyê kişandibû ser xwe. Ji hev re jêhatî bûn. Gava diçûn qereqolê ji Romiyan re stûyê xwe xwar dikirin. Fedî dikirin bigotana ku em ji Bênavê ne û gelê Bênavê ne. Xwe ji dê û bavên xwe dûr dikirin. Eslê xwe înkâr dikirin. Digotin: "Ji xwe tiştê ji me dernakeve".

Hin xortên Bênavê rabûn, gotin: "Wiha bênamûsî ye, ev bênamûsî nayê kişandin. Em vê zilmê û zorê qebûl nakin. Çima em jî weke gelên dinyayê nejin? Di dinyayê de kes heye ku bi zimanê xwe xeber nede? Çavsoyîya ku Romî li me dikin bes e. Em doza mafên xwe dikin".

Gotin ku axa û begên me di partiyên Romiyan de cih girtine. Bûne çoyên wan. Ji ber vê yekê bi karker û xebatkarên gel re divê ew bi yek bin. Bi navê karkeran ji xwe re partiyek çêkin.

Romî gotin: "Ev çend eşqiya ne, emê zû koka wan binin". Lê wan egîtan şerekî mezin li dar xistin. Romiyan bi 800 hezar leşkerên xwe, 200 hezar polîs û tîm, bi 30 hezar teresên Bênavê ve tevî tank, top, balefir û firokayan ve çûn bi ser wan ve. Dîsa bi wan mîrxasan re serî dervedixistin. Lewre ew ji aliyê heqiyê ne. Dibêjin: "Serhildan jiyan e".

Xwedê bi wan re be, hûn bimînin bi saxî û selamet.



xwe firotin. Di dewsa dan de, di beroşê de kevir dikelandin. Zar û zêçên wan ji birçîna qir bûn.

Di dawiyê de, Yewnan ji gundê Romiyan kirin der.

Kemo neviyê Selîm ji text xist. Xwe kir serokê Romiyan. Bi Yewnanan re li hev hat, dest bi pêstûriyê kir. Sazûmana îslamiyê rakir. Kemoizm danî şûnê. Got: "Romiyek bergîdanê dinyayê ye. Xwezî bi wî ku dibêje ez Tirk im. Romî, pesnê xwe bidin, bixebitin, bawer bikin".

Piştê xwe zexim kiribû. Soz û peymanê ku dabû Bênaviyê zû ji bir kiribû.

wan şewitandin, çavreşiya Elî Barût gelê Bênavê tu car ji bir nake. Kî bi ber wan ket dan ber gulleyan. Hin cehşên Bênavê xapandin û ber bi xwe ve kişandin. Bi alîkariya wan xîzanan mîrxasên Bênavê, Şêx Seîd û hevalên wî li Ameda Reş li ber bedenê daleqandin. Cendekê wan şehîdan bi rojan bi sêpiyan ve hiştin. Gotin bila Bênavî jê zendeyê (êbret) bistînin, bitirsin û careke din serî ranekin.

Di pey de gelê Bênavê li Dêrsimê serî rakir. Dêrsim cihekî asê bû, leş-

Romiyan êdî li gundên Bênavê xwedî derketibûn. Digotin: "Milkê me ye". Ji xelkê Bênavê re jî digotin: "Hûn Romiyên Çiyayî ne. Hûn li ser berfê geriyane, berfa bin piyê we qurte qurte kiriye. Lewma navê we bûye Kurd". Axaftina Bênavkî qedexe kirin. Zarokên Bênavê di dibistanên xwe de dan xwendin. Ew hîna zimanê xwe kirin. Her sibehê digotin: "Ez Romî me, rast im, xebatkar im.... Xwezî bi wî ku dibêje ez Romî me". Bi zarokên wan î heft salî sond didan xwarin. Mameste digotin: "Gere hûn

# 'Lûs û hêlînên çivîkan hilweşandin'

**M**ihrîcan vedibe û dest bi programa xwe dike xolkek li ser giyana şehîdên Kurdistanê û giyana Seydayê Cegerxwîn rawestî çêbû. Kek Behzad goterek li ser kurtejiyana Cegerxwîn, sinc, siruşt û nivîsên wî anî ziman. Li berehiyê Seydayê Tirêj dest bi helbestên xwe kir, gelek helbest xwendin mîna Textê Sedef, Şîna Rewşen Bedîrxan û hwd. Ey Welat jî yek ji van helbestan bû

## Fener Rojbîyanî

Helbesta Kurdî bi şeweyeke giştî jî helbesta gelêrî bi dirûvekî taybetî û karîgeriyeke bêsinor li ser xwendevanên Kurd dike. Sedema vê yekê jî siruştê Kurdistanê ya ciwan û bedew e, welatê deşt û çiyayên reng-reng, Sefîn û Metîn, Cûdî û Gabar, Pîremegrun, dehl û zevî, Ferad û Xabûr, Zab û Sêrwan e. Di vî warî de dîroknivîsê toreyî Kurdî rehmetî Aladîn Secadî dibêje: "Helbest û Kurd, Kurd helbest bi hemdê siruştê bi yek wate ne."

Gelê Kurd di vê delavê de xwedî li pêmahiya xwe ya helbestî derket, nemaze ya kevnare. Bi boneyeke taybetî jî layê nivîskar û helbestvanên Kurdên Başûrê rojava û di rojên 21-22 Cotmehê de bi boneyê koçkirina seydayê mezin, helbestvan Cegerxwîn li bajarê Heleb û Efrînê bû. Vexwendin û bangawazî ji ev helbestvanên han re hate birêkirin: **Tirêj, Keleş, Diya Ciwan, Umerê Lalê, Sîmyar Yezdî, Keça Kurd, Konê Reş, Dilawerê Zengî, Xemgînê Remo, Bextreş, Tengezar, Rûxweşê Zîvar, Jan Dost, F.Husêynî, Bêbihar** û gelek nivîskar, çîroknivîs, xwedî, nûnêr û berpirsiyarên rojname û kovarên mîna: **Aso, Pirs, Zanîn, Xunav, Stêr, Gulistan, Gelawêj, El-Hîwar** û **Welat** beşdarî vê mihrîcanê bûn.

Armançên sazîkirina mihrîcanê wek rêvebirên wê daxuyanî kirin ev in:

1- Ev mihrîcan, mihrîcaneke salî ye û wê tê de Seydayê Cegerxwîn bê bîranî û li ser helbestên wî lêkolîn û vekolîn wê çêbibin. Roja koçkirina wî, ji îsal pê ve wê bibe roja helbesta Kurdî.

2- Di mihrîcanê de wê nivîskar, helbestvan û çîroknivîsên Kurd bi hev re têkevin hevdiyan, guftûgoyên edebî û li ser têkiliyên giştî di pêşerojê de çêkirin û nêrîn û pêşniyarên xwe li ser avakirina dezgeheke toreyî mîna Yekîtiya Nivîskarên Kurd û danîna kovareke toreyî anî ziman. Di vî warî de gelek gavên heja ji hatin avêtin.

3- Helbest, çîrok, roman, şano hemû berhemên Kurdî wê di mihrîcanê de bê nîrxandin û rexnekirin. Da ku helbest û peşana Kurdî di vî beşê Kurdistanê de bi pêş bikeve.

4- Piştigiriya ji bo xortên nûgihayî ku di warê toreyî Kurdî de dinivîsînin û destê alîkariyê wê bidin wan ta ku xwe bigihînin payekî baş û daxwaza pêşerojê geş ji wan pênûsên sozdar bikin.

5- Di hundirê mihrîcanê de guftûgoyên ji bo ragihandina mihrîcana Çîroka Kurdî çêbûn û komîte ya birêvebir, **"Xelata Xanî"** ya kurteçîroka Kurdî ragihand.

Mihrîcan roja pêncşemê (21 Cotmehê/katjimêr 7'ê şevê) dest pê kir. Di bin serpeçîyê **Koma Xanî** ya toreyî çanda Kurdistanê de û birêvebirîya nivîskar **Abdul Ha-**

**lim Yusif** pêk hat. Berî mihrîcanê vedibe û dest bi programa xwe bike, xolkek li ser giyana şehîdên Kurdistanê û giyana Seydayê Cegerxwîn rawestî çêbû. Kek Behzad goterek li ser kurtejiyana Cegerxwîn, sinc û siruşt û nivîsên wî anî ziman. Li berehiyê Seydayê Tirêj dest bi helbestên xwe kir, gelek helbest xwendin mîna Textê Sedef, Şîna Rewşen Bedîrxan û hwd. Ey Welat jî yek ji van helbestan bû

## Ey welat

Ey welat'ê can bi gorî, gazîna te ji min nebi


Tu dizanî bi şev û roj ez xemxwarê te me  
Ger hemû kes aşîqê malê dinê, çavên reş in  
Ez evîndarê çiya, deşt û zinarên te me  
Ez delalê dengê qîza me, li qirş û qirmîkan  
Dengê qotîna şivan, hora hora cotkarên te me

Rewşa bilûra Memê, ji koka spîndarên te me  
Şal û şapîka li bejna canfidakarên te me  
Xêz û bendên Zendavîsta me li Geliyê Laleşê  
Pîremêrdê şehîrê merdîm, ez li ber arê te me  
Himê Qesra Serçexanê, sûr û benda Amedîm

Keleha Mêrdîne û dara herdu bajarên te me  
Her dem roja te bê, ez piştê nadîm dijminan  
Tu ji min bawer bike dijminê neyarên te me


Ger ku Tirêjîm bi rastî bîr û baweriyê'm ev e

Ta bi mirîne ger ne wa bim ez gunehkarê te me"



Seydayê Tirêj

weke nalînên evîndaran diçin  
Îşqa Kurdistanê çend gul ji bihara şewitî dane ser mil û li dil  
Niştîman bûye nigareke daliqandî, xwîna sor, perwaz e jê re  
Ho Ehora.  
Bo çî her salê biharê... di xwîne de dibin?!  
Ho Ehora Ehrîman îro kete van gund û şaran, bi hezaran dane ber lingên xwe nesrîn û binefs, nergîz û şîlan û sosin tev bi arê dojecha napelmê sotin.  
Lûs û hêlînên çivîkan hilweşandin, kemerên



Jan Dost

**Hêvî**  
Her car bihar tê, ez nizanîm çi qas kulîlk diçin  
Ne bo dilê min, bona dilê wê  
Îro min û biharê, çavên hev ramûsandin, kulîlkan ji min pirsîn!  
Kanî yara te kengî tê?  
Min hêsirên xwe li ber veşartin û min got: "Bila biharek din bê."  
Piştî re helbestvanê zîba û zîrek Rûxweş Zîvar helbesteke nûxwazî xwand

## Bihuştê Parsê

Bêkêrî li xwe kir, stûxwarî bi milên xwe xist.  
Hêstirên xwe şiyar kirin, li siya xwe siwar bû û hêdî hêdî berê da bihuştê parsê.  
Silavek pars kir, pê çavên derdên xwe kil dan.  
Gulek pars kir, pê şîna xwe xemiland.  
Ramanek pars kir, pê hişê xwe kire xewê.  
Xwast azadiyê pars bike, wînda bû."  
Piştî wî xwediyê kişwera şehîdan, Kek F. Husêynî helbestek xwend

## Windabûn...!!

Çep ke.. lê de, bistrê.. bi xwe re sema ke.. kes nabêje tu dîn î.  
Mey vexwe.. serxweş bikeve.. pesna xwe bidê kes nabêje tu derewîn î.  
Xwe gêj bike.. melûl bike.. hez bike.. kes nabêje tu bi evîn î.  
Serê xwe li diwaran xe.. destên xwe jê ke.. zimanê xwe pûç ke.. kes nabêje tu çima di mirîna xwe de dilezînî.  
Xwe nekuje, destê xwe bihêle, binivîsîne.. ma tê wînda bimînî?

Kes nabêje tu Xanî yî... yan Cegerxwîn î."  
Di mihrîcanê de gelek helbestvanên din jî ristên xwe xwendin.

Berpirsiyarê Giştî ya Kovara El-Hîwar gotarek li ser sinc û siruştên nivîskarên Kurd, bi taybetî yê Cegerxwîn û erka toreyî pênûsî di çareserkirina doza gelê Kurd a civakî û ramyarî de kir.

Di roja Îne de 22'ê Cotmehê hemû nivîskarên, mihrîcana xwe li bajarê Efrînê di Kela Horî de berdewam kirin û li wir jî wê tewêjeke kûr û dirêj li ser sazîkirina damek edebî da ku karûbarên toreyî bimeşînin, kirin. Di vî warî de hilbijartînek di nav hemû nivîskarên Kurd ên başûrê rojava de çêbûbû, jê kombesta amadekirina mihrîcanê ji bo karûbarên toreyî hate pejirandin. Ev kombest (komîte) erkekek bi rêk û pêk da ser milê xwe ji bo serkêşîya bizava toreyî Kurdî û derxistina kovareke demsalî li ser bingeha nûjenkirina toreyî Kurdî û ev kovar wê bibe weşana Yekîtiya Nivîskarên, li başûrê rojavayê Kurdistanê.



Diya Ciwan di navbera M. Hemo (aliyê cepê) û Rêweberê Mihrîcanê Ebdulhelîm Yusif (aliyê rastê) de

Piştî re xwediyê pirtûka Pêlek ji Deryayê Kowanên Min xwîşka Diya Ciwan beşdarî mihrîcanê bû:

"Dilê min

Dilê min neynîkek bû... Çawa dizivîrandin...  
Ayîna welatê min xweş tê de diyar dibû

Rahîştîne... li bin guhê erdê dan... kirin sed parçe, dema li parçên wê nêrîn dîtin ku ji ayînekê,

bûne sed ayîn...!!

Di vî warî de em dikarin bi şanazî bibêjin ku Diya Ciwan yekemîn kesê ji nivîskarên bi şeweyeke bedew û serkeftî bîreweriyên Kurdî dinivîsîne. Piştî re helbestvanê xort û ciwan, xwediyê pênûsa sozdar û pirtûka Kela Dimdimê jan Dost beşdarî vê şevbuhêrka toreyî bû

## Wêneya dawî di Avîsta de

Ev e karwanê hejaran yê li ser rêkên dirêj

agir li newqa van çiyayên me gerandin.

Ho Ehora.

Îşqa Kurdistanê tenê weke berfa serê çiyân, weke arê Babagurgur wê bimîne.

Îşqa Kurdistan tenê wê çivîkên barkirî li hêlînên biçûk û şewitî vegevine."

Di vî warî de xwediyê kovara Aso derbare van dengên nû di helbesta Kurdî de kêfxweşîya xwe diyar kir. Di pey wî re helbestvan Tengezar ev helbest xwend:

## Sê Çirûsk

Min sê çirûsk bi destê xwe girtin.. Yek za, bû cem û çikiya.

Ya dîn hehcecokeke penaber..ya dawî, helbestek kelogirî.

Hersê gihane hev... li ser welatekî ji bîr kirî.. girîyan."

Li dû hozan Tengazer, helbestvanê xort û ciwan Şêlan kîtek helbestî xwend:"



- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 53117 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 (Navbera saet 11.00-16.00)
- Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.